




# TÊKOŞER

Hêjmar 25

Îlon 1984



revue trimestrielle

driemaandelijks blad

!  
TÊKOŞER: KOVARA TÊKOŞER, YEKITIYA KARKER U XWENDEKARÊN  
KURD LI BELÇIKA

NAVNIŞAN: TEKOŞER  
B.P. 33  
1730 ZELLIK  
BELGIQUE

BUHA: 40 F.B., 2 DM, 6 FF.

ABONETÎ: 160 F.B.

N° BANKE: 426-3144071-85  
K.B.  
BELGIQUE

BERPIRSIYAR: M. Nezh YALÇIN

KOMITA REDAKSYONÊ: Ahmed, Derwêş M. Ferho, Pervîn, Yalçin

KARÊN TEKNİKÎ: Pascale DESRUMAUX

## TÊDAYÎ

-----

|  |       |
|--|-------|
| YILMAZ GUNEY ÇU DILOVANIYE .....                           | R. 3  |
| KURD U PIRSA KURDAN Lazarev .....                          | R. 4  |
| NAMEKE JI L. TINDIMANS RE .....                            | R. 9  |
| REWŞA KURDAN DI ŞERRE IRAQ U IRANE DE .....                | R. 10 |
| REWŞA IROYIN LI KURDISTANA TIRKIYE Yalçin .....            | R. 11 |
| DIROKA KURD U KURDISTAN Derwêş .....                       | R. 12 |
| TÛRKIYE KURDISTANINDA OPERASYONLAR Ahmed .....             | R. 14 |
| HELBEST: SONDA DOZA ME Jîyan .....                         | R. 15 |
| KURDISTAN, ÇEND NOT LI SER JINA ABORÎ U ÇANDI Pervîn ..... | R. 16 |
| TEGIHEŞTINA ÇIROKEN GEL Torî .....                         | R. 19 |
| HEFTA ÇANDI YA KURDISTANÊ LI ALMANYA .....                 | R. 23 |
| XEBATA ME .....  | R. 26 |
| TEKOŞER'DEN HABERLER .....                                 | R. 28 |
| NOLS U LE PEN .....  | R. 30 |
| STRANEK GELERÎ: XERABO .....                               | R. 32 |

# YILMAZ GÜNEY ÇÛ DİLOVANÎYÊ

Filmçêker, şoreşgerê kurd YILMAZ GÜNEY, di sala 1937 de, li Sîwerekê (qeza Rûhayê), hati bû dinê. Dayika wî ji Mûşê bû.

Ji ber rewşa aborî ew mecbûr bûn ku axa Kurdistanê berdî û herin bajarê EDENE. Li wir jîna çîna karker û bindestan baş fêr bû û dubendîya bîngêhî ya di nav bera çîna burjuwazî û karkeran baş dît. Wî her dem li rexa çîna bindest, gundî, feqîr û jaran cih stend û ew dijî mêtîngêkarîyê, zîlm, te-dayî û koletîyê derket.

Filmên ku wî çêkiri bûn pêşverûtîrîn û rasttîrînên filmên ku li Tirkîyê heta nuha hatine çêkirin in. Wî dixwest ku jî-nê weke xwe, neguhertî, darîçav bike. Lê feleka wî kurt bû, jîna wî dest ne da ku planên xwe bîne cih.

Pirtûkên ku li ser jîna gelên Tirkîyê û Kurdistanê nivîsî ji alîyê her kes, bi awakî zelal û vekirî, dihatin xwendin.

Wî jîna xwe di bin kontrola leşker û polîsan de derbas kir. Pîrr caran hat girtin, lêdan û êşandin. Wî ev nexweşîya xwe jî ji zindanên cunta faşîst stendi bû. Lê wan ne karî wî ji dîtina wî ya rast gavek paş bihêlin.

Wî piştî xwe, ji gelên Tirkîyê û Kurdistanê Tirkîyê stend. Karker, gundî, demokratên kurd, tirk û hindikayîyên Tirkîyê piştîgirtîya wî dikir. Çaxê filmên wî dihatin lehîstin di salonên sînemê de cih û rê tûne bûn. Gelê me jê heskirina xwe êşkere dîda xuyakirin. Wî ekolek nuh di sînemê de vekir. Filmên wî yê mezintîrîn Hêvî, Heval, Kerî û Rê bûn. Wî, di van filman de, bi awakî êşkere jîna gel danî ber çavan û xelatên mezin stendin. Filma wî, Rê "YOL", di sala 1982 de, li bajarê CANNES, li Fransa, Xelata Zêrîn stend.

Di sala 1981 de, ji girtîgehê rêya revê da çêkirin û hat Ewropa. Ew ji gelên Tirkîyê û Kurdistanê dûr ket, lê tu caran ji bîra xwe ne bir. Di sala 1982 de ji welatîya Tirk hat avêtin.

Wî di filma Rê "YOL" de gelê kurd baş da nasîn. Dixwest ku filmên kurdî li Kurdistanê çêke, lê jîna wî dest ne da.

Li Parîsê, di 24 sebat 1983 de, wî di şeva vebûna Enstîtuya Kurdî de axaftinek pîrr hêja kir û êşkere piştîgirtîya gelê xwe kir. Bû hîmdarê Enstîtuyê. Di roja 9 îlon 1984 de çû dîlovanîyê. Di roja pêncşemê, 13 îlon 1984, de li Parîsê, Enstîtuya Kurdî ji bo cenaza wî rêveçûn amade kir. Nêzîkî 6000 kes beşdarî wê bûn.

Di dawîya emrê xwe de wî biryarek tarîxî ku di dîroka Kurdistanê de nayê jibîrkirin da, xwe spart gelê xwe. Di wesiyetê xwe de vana xwest:

- laşê wî bête Enstîtuya Kurdî û xelkên cîhanê, biyanî, Tirk û Kurd bêne sersaxîya wî, li Enstîtuyê.
- li goristana "Père Lachaise" bête veşartin. Li vê goristanê, di Komuna Parîsê de, di sala 1879 de, şehîdên şoreşê hati bûn binaxkirin.
- roja ku Kurdistan rizgar bibe laşê wî di axa Kurdistanê de bête veşartin.

Ewê YILMAZ GÜNEY di dilê gelên Kurdistanê û Tirkîyê de agirek netemirî bimîne.

# KURD Û PÎRSA KURDAN

Dr. M. Lazarev

Dîrokzan (1)

Kurd - di Rojhilata Nêzik de, mezintirîna cemaetên etnikî - heta nuha ji mafên xwe yê netewî mehrûm in. Lê belê, ev gel kevntirîne rûniştevanên eslî ên Rojhilata bakûrê Asya tê hesibandin. Û heta ji hebûna rast a Kurdan 2000 sal berê miladê hatiye behs kirin. Ew, bi awakî fi'li keti bûn nav hemî bûyerên naskirî ên şerr, rêzan (siyaset) û medeniyetên imperatoriyetên ku ji berê bi nav û deng bûn û ên dewletên navçeya fro. Gelek serokên leşkeriyên naskirî (weka Selaheddîne Eyyûbiyê bi nav û deng ku Xaçparêzan "Selîbiyan" şikandi bû), şexsiyetên rêzanî û stêrkên bêje û hunerê Kurd bûn.

Kurd, bi pareke mezin jî, ketin nav tevgera rizgarîya netewîya gelên Tirkîyê, Iranê û welatên ereb, dijî kolonyalizmê û nav têkoşîna ku fro di vê navçeyê de dajo, dijî empêryalizm û paşverûtîyê. Loma, pêwist e ku em, ji pirseke giring û germ bêtir, bala xwe baş bidin gelê kurd, dîroka wî, çanda wî û rewşa wî ya fro.

Berê her tiştî, pêwist e em Kurdan weka gelekî bi carek serbixwe wesf bikin. Ew xwediyên sifetên etnikîyên ku pîrr baş xuyane û ku delfîlên ilmîyên bê gûman te'kîd dikin. Û pîrr pêwist e em vî tiştî nişan bidin, ji bo ku hin idareyên şoven di hin welatên Rojhilata Nêzik de heta nuha tecrube dikin ku esîlbûna êtnikiya Kurdan înkâr bikin û wan carna Tirk, carna Faris û carna Ereba - û di baştirîn rewşan de wan weka komeke êtnografiyeye xusûsî - dihesibînin. Lê belê, pîranîya Kurdan yekayîyeye etnikî, ji aliyê ziman û yan jî cografya be, teşkil dikin.

Kurd zimanekî wan ê cihê heye. Ew perçeke ji zimanên îranîyên rojhilatî ye, û ew zimanekî medenî ye ku di kevnûnê de dîroka wî esîl e û ku li ser wî bêje yeke pîrr gi-

ranbiha şîna bûye. Ji xusûsiyetên wî pîranîya zaravên wî ye, ev zaravên ku bi du awayên bîngehî - di Rojhilata Bakur (yan li Bakurê) û Rojhilata Jêrîn (yan Navîn) de - dicivin. Zaravê yekemîn, navê wî Kurmancî ye û ê duwemîn jê re, bi pîranî, Soranî dibêjin. Di nav van her du awayan bi xwe de zimanê bêjeyîyê kurdî ê fro gulên xwe vedike. Di kurmancî de alfabe ya latînî a ku li gora wî hinek guherîye, û di soranî de alfabe ya erebî tê bi kar anîn. Lê, Kurdên Yekîtiya Sovyêti tîpên kirîlî bi kar tînin. Di zimanê kurdî de awayên bêjeyîyên cihê - zarav û tîp - hebin jî, ew, ji gelek sedsalan heta nuha, bîngeha maddî ye ji bo pêşveçûna çandeke netewî, esîl û yekbûyî, û ew nîşeyên pîrr bedew û bi ber (yaraticî) ji hunerê gelerî ên ku bi para xwe ya giran beşdar bûn medeniyeta gelên Rojhilata Bakurê Asya da. Ev tişt bi xwe ji bo avêtina iddî'ayên her merivekî ku esaleta êtno-gelerîya gelê kurd înkâr dike bes e.

Gelê kurd, ji sedsalên kevntirîn de, di eynî vê navçeya fireh a perça Rojhilata Bakurê Asya de û ku navê wê ji sedsala dozda de Kurdistan (ango welatê Kurdan) e rûniştîye. Ev nav ma'nayê wî bi tenê êtnografi ye. Bi taybetî, sînorên Kurdistanê ên qeydkirî tunne ne. Loma, hemû zanînen me ên jimari li ser cih û aqara wê bi tenê teqrîbî û teqdîrî ne. Welatê Kurdan, bi nêzikayî, di nav 34 û 40 derecên firehbûna bakurê de, û di nav 38 û 48 derecên dirêjbûna rojhilatê de, ye û ew tevayîya perça navîna vê çarçûmê digre. Sînorên wî di Rojavaya Bakur û Jêrîn de her du Deryayên

(1) Kovara "Asya û Afrika, Îro", hejmar 12, sal 1983, Mosko.

Wergêrandin: rûsî-erebî: Wês, kovara Newroz, 1984. Erebi-kurdî: Pervîn.

Reş û Sipî ne, lê di Rojhilata Bakur û jêrîn de Deryayê Qezwîn û Xelîcê Farisî ne. Dirêjbûna wî ji Rojhilatê heta Rojavayê nêzîkî 1000 Km ye, û ji Bakurê heta Xwarê 300-500 Km ye. Aqara vê navçeyê a giştî ji 450.000 Km<sup>2</sup> bêtir e. Ango, bi nêzîkayî, ji hin dewletan, weka Ingiltere yan Komara Almanya Federal bi du carî mezintir e. Nêzîkî nîvê wî di nav Tirkiya îro de ye. Ji 150.000 Km<sup>2</sup> bêtir ji Iranê re, nêzîkî 75.000 Km<sup>2</sup> ji Iraqê re û

15.000 Km<sup>2</sup> ji Sûriyê re ye. Hin Kurd jî li derveyî van navçeyan dijîn (Rojavaya Tirkiyê, Rojhilata Bakurê Iranê, li Lubnanê, Afganistanê, di komarên paş Qafqasya Sovyêti û navînen Asya).

Bi vî awayî, Kurdistan, ji aliyê cografî, di nav bera çar dewletên Rojhilata Nêzîk de perçe bûye û ew rast bi rast dikeve meydana jîna hundurî û pêwendiyên derveyên van welatan. Erdên ku Kurd tê de rûniştine li ser sînorên jêrîn ên Yekîtiya Sovyêti (paş Qafqasya) ne. Ji bo van hemû sedeman, giringiya Kurdan di rêzana cihanê de, û ne bi tenê di Rojhilata Nêzîk de, pirr mezin e.

Lê, rola Kurdistanê di meydana cihanê de ne bi tenê ji sedema cihê wê ye. Em du sedemên dinên giring û maddî jî dibînin: damezrana erdê û dewlemendiya tebîî. Kurdistan, bi piranî, welatekî çiyayî ye. Bi dirêjayî û bi firehî zincîrên çiyayên ku navên wan kirine çiyayê Ermenî-Kurdî û çiyayên Zagros wê jêdikin. Hin serên wan ji sê çar hezar metre bilindtir in. Loma, hemî Kurdistan weka keleke tebîî ye, gihiştina wê zor e, bi hêzani di zivistana serma û berfîn de.


Giringtîrîna dewlemendiyan tebîî ên Kurdistanê, bi taybetî, petrol e. Bîrên petrola Kerkûkê (Kurdistanî Iraqê) pirr bi nav û deng in û ew jimara pêşîna cihanî distînin, eger ji aliyê pîrbûna intaca birekî bi tenê be (di rojê de ji 5 heta 10 hezar ton), yan jî ji aliyê intaca petrolê li gora her metreke di kolana bîran de (3300 ton) û yan jî ji aliyê buhayê mesrefa intacê be (di nava salên 1960 de: 42 sent ji bo bermîlekî, li hemberî 151 sent li Dewletên Yekbûyên Emerîkî, 63 li Venezuelle, 98 li Kuweyt û 95 li Erebiyên Suûdî). Piranîya bîrên petrolê ên

navçeyên dinên Kurdîstana Iraqê, Îranê, Tirkiyê û Sûriyê, û yan jî ên navçeyên dinên nêzîkên wan (nîşandana depoya "zêrê reş" ku di cihanê de bi nav û deng e, di navçeya Xelîcê Farisî de, bes e) tînin bi kar kirin. Erdên kurdî bi serwetên tebîîyên din jî dewlemend in. Giranbuhatîrînen wan cihên xamên Kromê, li Kurdîstana Tirkiyê ne. Kanîyên avê jî ji Kurdîstanê re hêzeke aborîyeke pirr mezin temîn dikin. Di dawiyê de, ev welat xwedîyê gengaziyên rojên li ber me, ji bo firehkirina zîraetê û serweta daristanan, bi hêzani jî bo xwedîkirina bizinan bi xêra pîrbûna zozanên derca yekemîn.

Kurd, piranîya mezintîrîna rûniştivanên Kurdîstanê teşkîl dikin. Li ser vê yekê, jimarên pirr rast nînin in, lê, li gora gelek texmînan, piranîya kurdî, di navçeyên Kurdîstanê ên cihê de, ji 75% bêtir e û digihêje 90%. Îro jimara Kurdan nêzîkî 20 milyon e. Nêzîkî 85% ji wan li Kurdîstanê dijîn. Li gora statîstîkên teqrîbî, nêzîkî 47% ji Kurdan li Tirkiyê, ji 31% bêtir li Îranê, 16% li Iraqê, 3,5% li Sûriyê, 1% li Yekîtiya Sovyêti, 15% di welatên din e, dijîn. Ji van jimarên em, bi hindîkî, du netîceyan pirr giring distînin. Yek: Kurd îro, ji aliyê jimarê, mezintîrîne gelên hemî cihanê ye ku mafên wî yê netewî tînin pelixandin (bi taybetî, ji xeynî Yekîtiya Sovyêti). Du: di her welatekî Rojhilata

## КУРДЫ И КУРДСКИЙ ВОПРОС

М. ЛАЗАРЕВ  
Доктор исторических наук



Nêzik ku Kurdistanê perçe dike, Kurd hindikayîya êtnîkîya mezintirîn teşkîl dikin (li Tirkîyê, 38% ji jimara hemî rûniştevanan, li Iranê 16%, li Iraqê 28%, li Sûriyê 11%). Ji van zanînan statîstîkî giringîya yekbûna pîrsa kurdî xuya dibe. Ji aliyê olî (dînî), pîranîya Kurdan misilmanên sunnî ne, û nêzîkî çarîkeke wan şîî ye (pîranîya wan hevalbendên terîqetên şîî, weka Eli-Îlahî, Ehlê Heq, ku li Tirkîyê navê wan dikin Elewî, ne). Nêzîkî 200.000 Kurdên yezîdî xwedîyên oleke xusûsî ku bawerîyên misilman û hin ji kevn-tirînan olên Rojhilatê yekkirîye ne. Li gora bawerîya hin rojhilat-zanên ku em bi wan bawer in yezîdîtî ola Kurdan a yekemîn e û ew di bin tesîra Îslamê guherîye. Li gel vê qasê, fêrên îslamî kokên kûr di nav kitleyên gelerîyên kurdî de ne avêtin. Li vîra, baş e ku em pêşgotîya Tirkan a bi nav û deng bêjin: "eger em Kurdekî bi kafiye re muqayese bikin, Kurd misilman e". Loma, li Kurdistanê, şebeke terîqetên çewt - li gora dîtîna Îslamê orthodoxe - a taîfên derwîşan ji berê hebû û îro jî heye, û ew di jîna civakî, olî û çandîya Kurdan de roleke giring dilîze.

Kurd, ji aliyê pêşveçûna civakî, aborî û çandî, gelekî rojhilatîyêkî safî ye. Erdên ku Kurd li ser wan rûdinên di welatên ku tê de pêşveçûna kapîtalîzmê û bermayîyên pêwendîyên civakîyên fêodal û heta ên pêş fêodalîzmê, bi hev re diçin, cih stendine. Lê, pêşveçûna navçeyên kurdî, ji aliyê aborî û pêwendîyên civakî û çandî, li gora navçeyên ku tê de Tirk, Faris û Erebi rûniştine, kêmtir e. Pîrr sedemên dîrokî yan rêzanî vê rewşê tefsîr dikin. Ev sedem ev in ku demên zor in ku pêşveçûna civakî, aborî û çandî rawestandine û ku tê de gelê kurd ku ji mafê çarenûsîyê xwe mehrûm e dijî.

Bi vî awayî, di civaka kurdî de xurttirînan bermayîyên pêwendîyên eşîrî hîn jî dijî. Di dîroka nêzik a Kurdan de, tesîra perçekirîna hemî gel di nav eşîr û konfêdêrasyonên eşîrî de hîn jî dajo, bi hêzanî li Kurdistanê Iran û Iraqê. Di hemî perçeyên Kurdistanê de, bi awayên cihê û vekirî, sistemeke ecêb heye ku xwe li ser menfaetên aborî û hêza sîyasîya fêodalîst olî û sîvîlên kurd (bi awakî giştî, ew serokên eşîran in) dirawestîne.

Li gel vê qasê, di dema me ya nuha de, ev damezrana klasîka civaka kurdî, di bin tesîra pêşveçûna ku nayê şikandin, guherî. Netîceyên pêşveçûna kapîtalîzmê (di vî warî de, Kurdistanê Tirkîyê di serî de ye) ev bûn: şikandina cihê fêodalîstên kurd, xuyabûna xwedîyên erdên ku serweta xwe bi awayê kapîtalîst idare dikir, avabûna burjuwazîya netewî (di bajaran de) ku di destpêkê de bazarî û paşê sînaî bû, pêşveçûna çînan navîn û avabûna kadroyên prolêtêrên kurd. Pêşveçûna ewrupayîbûnê, derketina gundîyan ji erdê xwe û bi huneran mijûrbûna wan (li ser de jî, ji gund û zozanên xwe pîrr dîrketina wan), hîcretkirina hêzên karkerên kurd (bi hêzanî ên Tirkîyê) welatên bazara hevrayî (muşterek), zû pêwendîyên eşîrî û bîngehên wan ên aborî - xwedîkirina lawiran - hilweşandin. Ev guhartina pêşverû ya qenc di navçeyên din de jî (ên welatê Kurdan) serdest bû.

Li gel vê qasê, civaka kurdî a îro, ji aliyê pêwendîyên civakî, ne di dereceke bilind de ye. Awayên fikrîyên-sîyasîyên paşverû ku heta berê zemanên kapîtalîzmê de jî hebûn hîn jî tesîr dikin li ser hemî meydanên jîna wê.

Ev rewş rast bi rast li ser kitleyên gelerîyên kurdî tesîr dike. Ew, di vê dema guhartinê de, bi hemî giranbûna abora erdên ku Kurd li ser rûdinên dihesin. Ji alîkî, awayên kevînan aborê ku bi navê "fêodalîzma koçerî" tê nasîn hildiweşin û ji alîkî din jî kapîtalîzma pêşveçûyî hêzên întacê hîn venekirin. Bi pêşveçûna xwedîkirina heywanan a bi metoda koçerîya kevn ku bîngeha abora eşîrên kurd e, ne întaca zîrafî û ne xwedîkirina lawiran û ne jî cotkirina erdê pêş de çû. Vebûna ne kaff a sînaet û infrastruktura Kurdistanê firsetên kar ji bo gundî û hunermendên belengaz digihîne krîzeke tûj. Karkerên kurd, di çûna xwe de ber bi navendên sînaî ên welatên ku ew tê de dijî û derveyî welêt, ji bo ku li kar bigerin, rastî xwînmêjîyê pîrr kirêt tên. Ji sedema kêmbûna zanebûna wan, ew pîrr caran mecbûr in pîstirînan karên ku ji wan re huner pêwîst e bikin.

Rewşa aborî û civakî a karkerên kurd ji a karker û gundîyên tirk, erebi û faris pîrr pîstir e. Ev heta di van zanînan de jî xuya dike: meaşê merivekî li Kurdistanê Iranê,

di sala 1975 de, 150 dolar bû, li hemberî 1340 dolar ji bo merivekî di tevayîya Iranê de. Li Iraqê, navçeyên kurdî ji dehan yek para projeyên pêşvebirina welat stand. Ji 150 projeyên sînaî, bi tenê çar proje ji bo avakirina navçeyên kurdî hati bûn danîn, her çend e ku ji xeynî petrolê, maddeyên xamên pêwîst ji bo helandina madenan li wira bi xwe hene. Li Kurdîstana Tirkîyê, di sala 1970 de, ji bo 10.000 rûniştewan doktorek tenê hebû, lê di tevayîya Tirkîyê de ji bo van deh hezaran 43 doktor hebûn. Li Kurdîstana Iranê, navçeyên sera ser hene ku jimara rûniştewanên wan ji 20.000 bêtir e û tê de doktorek tunne ye. 50% ji tevayîya malîyên Kurdîstana Iranê di odeke tenê de li ser hev kom dibin û 80% ji tevayîya xanîyan ji herrîyê ne û yan jî di erdê de hatine kolan. Em vava bi rewşa rûniştewanên navçeyên pêşveçûyîtirên Iran û Iraqê muqayese bikin: rûniştewanên Kurdîstana Iran û Iraqê ji lêhîya petro-dolarên ku ji van her du welatan re di deh salên dawî de, di munasebeta bilindbûna mezîna buhayê petrolê hat, pîrr hindiktir kar kir.

Bi vî awayî, em dibînin ku navçeyên ku Kurd tê de rûniştine, li Tirkîyê, Iranê û welatên ereb, he-ta ji navçeyên welatên Rojhilata îro (ku li gora welatên ku xwedî şenayî pîrr bilind in paş de mane) jî paşvetir in. Ev jî netîca êşandina Kurdan e, di gelek sed-salan de, ji alîyê navbendên serdest û çînen zordest ên van welatên ku Kurdîstanê perçe kirine. Û weka ku van malbendên serdest ê hukûmetên Rojhilata Nêzîk Kurdan êşandin, dewletên kolonyalîst jî eynî kir. Wan, di demeke dirêj de, reqabet û îdareta Kurdîstanê anî cih, bi awakî vekirî yan girtî (bi hêzanî, li Iraqê. Ew çil salan ket bin panîya Ingiltere).

Bi taybetî, ev rewş pîrr zorîyên giran di rîya pêşveçûna netewî a gelê kurd de derxistin. Ji alîkî din jî hêzên paşverûyên hundurî û derveyî ji paşvemaîya Kurdan a civakî-aborî û çandî (weka şerrên eşîrî, nezanî û bindestîya gel), ji bo menfaetên xwe, kar kir. Netîca vana ew e ku pîrsa kurdî tevlihevtirîn û xwedîyê çara zortirîna pîrsên netewî ên navçeya Rojhilata Nêzîk bû û hîn jî ewha ye.

Kurd gelekî rizgarîxwaz e û bin-

destkirina wî ne mumkun e. Tevayîya dîroka kurdî bi serhildanên rizgarîyê, dijî zordestîya biyanî, tije ye. Qedana van serhildanan bi şikestinê, di demên kevn de, serdestîya fêodalîzmê li Kurdîstanê û mezînbûna imperatorîyên leşkerî ku bê rawestan erdê Kurdîstanê perçe kir û xwar nîşan dide. Ji sedema hilweşana imperatorîya osmanî û Irana şahî di sedsala nozda de, ev imperatorîyên ku Kurdîstanê di sedsala şazda de perçe kiri bû, tevgera rizgarîyê a kurdî pîrr fireh û geş bû. Ew bû tevgera netewîyeke rast, ji bo ku di netîcê de amanca wê avakirina dewleteke kurdî û yekbûyî bû.

Lê, zorîyên nuh di rîya cih'anîna daxwazîyên netewî ên gelê kurd de derketin. Ji giringtirînen wan, mezînbûna têkilîya dewletên kolonyalîst ên ku amanca wan jî hilweşana Tirkîya Osmanî û Iranê kar bikin ji bo ku destê xwe deynin ser hebûnên wan ên aborî û stratejîyên giring. Ji bo vê amancê, ev dewlet ji tevgerên netewî bi awakî fireh kar kir, van tevgeran weka dîvên empêryalîzmê nîşan da, ew dijî hevdu rakirin, mezînen fêodalîen eşîrî û dîni kirin .... Ji vê têkilîyê hindikayîyên êtnîk ku ji bo rizgarîyê têkoşîn dikir (di imperatorîyên osmanî û iranî de) tu tişt kar ne kir. Di eksê wî de, rewşa wan, Kurd jî di nav wan de, tevlihevtir û heta pîstir jî bû. Di netîcê de, şerrê duwemîn perçekirina gelê kurd mezintir kir. Kurdên ku ji berê di mêtîngêhen erebî ên Tirkîyê de rûniştî bûn, paşê xwe li Iraq û Sûriyê dîtin. En yekemîn di bin îdareta kolonî a Ingiltere û ên duwemîn di bin a Fransa de bûn. Têkilîya vekirî a kolonyalîzmê li Kurdîstanê zorîyên nuh li ser rîya çaredîtina pîrsa netewîya kurdî danîn.

Ji alîkî din jî rabûna pêla şerê cotmehê di hemî cihanê de û destpêka dema krîz û hilweşana sistema kolonyalîst a empêryalîzmê ji gelê kurd re meydanên ku ji berê tu kes ne dîtî bû vekirin. Giringîya vê bûyerê bi xwe ne zorîyên muweqet ku netîca (aktîf-bûna) empêryalîzmê li Rojhilata Nêzîk bûn, lê qedera gelê kurd tesbît kir. Tecruba Yekîtiya Sovyêtî di dîtina çara pîrsa netewî de bû sedemeke giring ji bo amadekirina hemî rewşên ku firset dîdin pêşveçûna netewîya rast, bi hêzanî, ji Kurdên ku di welatên

me, û bi piranî di komarên paş Qafqasya, de rûniştine.

Di salên bîst û sîyan de, pêleke bilind ji serhildanên kurdî li Tirkîyê, Iranê û Iraqê rabû, di ji serdestîya kolonyalist û rêzana şoven a hukûmetên Rojhilata Nêzîk li hemberî pîrsa kurdî. Lê, ji nuh de, Kurd şikestinê kişandin û di cih'anîna daxwazên xwe yê meşrû di van dewletan de, bi awakî ciz'î jî be, serfiraz ne bûn. Di van serhildanan de qelsbûna leşkerî û rêzanî û xurtbûna prensîpên civakîyên paşverû di civaka kurdî de û di dawîyê de rewşa cîhanê a ji Kurdan re ne munasib xuya bûn, bi hêzanî, di vê dema ku tê de tevgera kurdîya netewî derbas bû merheleke nuh û gava ku bi awakî pîrr vekirî şikandina metodên fêodal û eşîrî di têkoşînê de û avakirina rêxistinên rêzanîyên gelemrîyên aktîf ku karîbin hemî gel idare bikin û bikişînin paş xwe pêwîst bû. Gelê kurd, di rabûna têkoşîna xwe ya rizgarîyê de, di dawîya şerrê cîhanê ê duwemîn û şûn de, ji fêrên dema nav her du şerrên cîhanê kar kir.

Piştî guhartinên paş şerrê cîhanê ê duwemîn ku li her der hatine nasîn, tevgera netewîya kurdî merheleke nuh derbas kir. Em karîn bêjin ku ew, ji aliyê hêzên wê yê pêşeng û serokatîya wê, û awayên têkoşîna xwe de, eger ji aliyê çîni hêzên pîrr fireh yek kiribe jî, tevgera şoreşgerî û dêmokratîk e. Têkoşîna Kurdan ji bo stendina mafên xwe yê çarenûsî li ser bingeheke dêmokratîk, di enfyêke fireh de, pêş de ket. Li ser de jî, daxwazîyên civakî ên ku menfeetên çîni ên civakên karkeran bi xwe nîşan didin roj bi roj giringtir dibin.

Piştî şerrê cîhanê ê duwemîn bi demeke kurt, di cih de, Partîya Dêmokratîk a Kurdîstanê ku li Iranê xuya bû vê tevgerê xist bin destê xwe û di cewherê xwe de hemû hêzên welatparêz ên civaka kurdî ku ji bo mafê xwe yê çarenûsî têkoşîna dikir yek kirin. Piştî wê, partîyên din, di bin eynî navî de, li Iraqê û Tirkîyê ava bûn. P.D.K. roleke tenzîmîyeke giring lîst di hişyarbûna tevgera kurdî de, li Irana piştî şerr û di tevgera netewî a Kurdên Iraqê de ji salên şêstan heta salên heftêyan. Di dirêjbûna dema piştî şerr de, Kurdîstana Iran û Iraqê bû bû meydana

yekemîn a têkoşîna netewîya ku serokê wê yê ku (heta nîvê salên heftêyan) hati bû qebûlkirin, Mustafa Berzanî, serokê P.D.K. a Iraqê bû. Ew di tevgera netewîya Kurdî a sedsala XXa de mezintirîn şexsiyetên Kurdan bû, her çend e şexsiyeta wî xwe diguhera.

Netîcên têkoşîna fedakar a gelê kurd ji bo mafên xwe yê meşrû ne bi tenê bi yek ma'na ne. Ew ne bi tenê tevayîya tevlihevî û lihemberîya rewşê li meydana Rojhilata Nêzîk û cîhanê nîşan didin. Ew mercên dîroklî ên pêşketîna civakî, aborî û rêzanî ên hundurî li hemî perçeyên Kurdîstanê jî nîşan didin. Bi vî awayî, Kurdên Tirkîyê tu tişt kar ne kir, ji bo ku ji wan re her awayê jîna netewî qedexe ye. Ji van awayan jî bi zîmanê netewî di dibistanan de mafê hînkirinê û weşandina bêjê. Li gora hînkirîneke resmî û şoven, navê Kurdan li Tirkîyê bûye "Tirkên çiyayî". U her tevgera rêzanî di nav wan de bi hişkayî tê pelixandin.

Rewş li Kurdîstana Iranê hinek cihê xuya dibe. Li wira, hin mercên objektîf hene ku firsetên minasîb dan ji bo firehbûna tevgera netewîya kurdî. Piştî şerrê cîhanê ê duwemîn bi demeke kurt, li Kurdîstana Iranê komareke otonom - cara yekemîn di dîroka kurdî de - ji bo zemanê kurt ava bû. Lê, di dawîya sala 1946 de, ev komar ji aliyê hêzên paşverûyên franî û emperyalîstên yekbûyî hat xera kirin. Piştî wê, di nêzîkî 30 salan de, hukûmeta Şahê dîktator tevgera kurdî di dewletê de bi hişkayî pelixand (informasyonên resmî navê Kurdan kir "Farsîyan ku bi awakî muweqqet urf û adetên xwe yê netewî jî bîr kirine"). Lê, wî vî karî bi nermîyeke naskirî kir, û di eynî zemanî de jî tecrube kir ku tevgera kurdî li Iraqa cîran, ji bo menfaetên xwe, bixe bin destê xwe.

Şoreşa îslamî û şerrê Iran û Iraqê ku zû piştî wê dest pê kir ji nuh de giringî û geşbûna pîrsa kurdî li Iranê nîşan dan. U ew bi awakî mutlaq rastîyeke vekirî ye ku îro li Iranê pîrsa netewî, û tê de pîrsa kurdî, bi hemî bilindîya bejna xwe rawestayê.

Tevgera netewîya kurdî li Iraqê gihaşt firehtirîna mesafa xwe. U ji 1961 (bi awakî veqetayî) serhildana Kurdîstana Iraqê ku hêzên Iraqê tu nikarî bû vemirînin geş



# NAMEKE JI L. TINDEMANS RE

Di tarîxa 19.6.84 de, nûnerêk ji Têkoşer û nûnerên Komîta Belçîkî ji bo Parastina Mafên Mirovatiyê li Tirkîyê, Sendîka Sosyal-Chrétien C.S.C. û Mraz (Komela dijî Nijadparêziyê), bi awayê dêlêgasyoneke, çûn dîtina Léo Tindimans, Wezîrê Karên Derve ê Belçîka û serokê grûpa sosyal-chrétien a parlamana ewropa, ji bo ku bi wî re li ser rewşa Tirkîyê û Kurdistanê Tirkîyê bipeyivin. Lê, mixabin, wezîr bi xwe ne hat civînê. Dêlva wî, berpirsiyarên kabîna wî amade bûn.

Ji xeynî axaftinan, Têkoşer ji Léo Tindemans re nameke ku nûnerê me da destê alîkarên wî nivîsî.

Naveroka nama me ev e:

Wezîrê hêja,

Piştî stendina hukmê ji aliyê hukûmeteke sîvîl li Tirkîyê û piştî helbijartinên mehlliyên dawîn, gelek ewrupî bawer kirin ku Tirkîye gavek avêt ber bi dêmokrasîyê. Lê, ji bo Kurdan, ji Tirkan bêtir jî, ev bi tenê dêmokrasîya camekanan e.

Eger ji bo Tirkan îsbata tunnebûna dêmokrasîyê ev e ku leşker hîn jî destê xwe avêtiye ser hukûmeta sîvîl, ku kadroyên kevn ên ku di bin hukmê leşkerî de merkezên giring stendi bûn ne guherîne, ku hemû partiyên siyasî nikarî bûn bikevin helbijartinan, ku merivên sendîkî û xwenda hîn jî di girtîgehên de dirizin, ku bi deh hezaran meriv hîn jî tîr girtin, eşandin û yan

di bin hukmê mirinê de ne, û ku jîna maddî ya xelkê her dem zortir dibe, ji bo Kurdan, ji xeynî vana, sedemên din hene ku tunnebûna vê dêmokrasîya derewîn îsbat dikin. Ev sedem ev in:

Ne bi tenê rêxistinên siyasî û çandîyên kurdî hatine rakirin û berpirsiyar û sempatîzanên wan hatine eşandin yan kuştin. Her merivekî ku biwêre bêje ku ew Kurd e, yan bi dizî mûsiqa kurdî guhdarî bike, yan nivîsarên kurdî bixwîne, yan di dayirên resmî de bi kurdî bipeyive..... tê girtin.

Eşandin ne bi tenê di qaraqolan û girtîgehên de, lê li meydanên gund û bajarên jî li ser xelkê tê kirin. Amanca tetbîqatên leşkerî û dorgirtina van bajar û gundan ji aliyê leşker tirsandina gel e.

Hûn baş zanin ku zordestîya netewî li ser gelê kurd ne firo dest pê kiriye. Ji sala 1924 û pê de, mafê bi zimanê kurdî peyivîn û danfina rêxistinên kurdî qedewe ye. Di dirêjayîya dirokê de, bi sed hezaran kurd hatin kuştin yan jî ji cihê xwe hatin avêtin. Hebûna gelê kurd bi xwe hat inkarkirin. Bi awakî resmî navê Kurdan kirine "Tirkên çiyayî" yan "Tirkên Rojhilatê". Lê, ji 12.9.1980, tarîxa stendina hukmê ji aliyê leşker, û şûn de, rewş pir girantir bû. Iro qetlîfameke Kurdan a rast, canî û çandî, hatiye kirin. Amanca wê bi zorê û bi tirsandina merivên besît ên ku bi sîyasetê qet mijûr nabin gelê kurd assîmîle bibe.

Li gora me, li kîjan welatî be, eger hukûmetek mafê bi zimanê xwe xwendin û nivîsandin û heta mafê hebûnê ji gelekî re qedexe bike, ne mumkun e ku meriv sifeta dêmokrasîyê bide wê yan bawer bike ku ew ber bi dêmokrasîyê diçe.

Wezîrê hêja, em ji we hêvî dikin ku hûn ji berpirsiyarên hukûmeta Belçîka û ên Parlamana Ewropa bixwazin ku ew hukûmeta Tirkîyê, ji aliyê siyasî û aborî, asê bikin û ku avakirina dêmokrasîyeke rast jê bixwazin.



# REWŞA KURDAN DI ŞERRÊ

## ÎRAQ Û ÎRANÊ DE

Di bin serîyê "Serhildaneke geleri li Kurdîstana Iraqê", CARDRI, Komîta dijî pelixandinê û ji bo mafên mirovatîyê li Iraqê, London, di tarîxa 7.6.84 de, bi inglîzî, ewha dinivîse: "Hatina nûçeyan ji Iraqê dajo. Serhildaneke geleri, tevî grêv, rêveçûn û bi polîsê rêjîma Iraqê re lihevîstî, gihast bajêr û gundên Kurdîstana Iraqê. Ev serhildana gelê kurd bi mezintirîna rêveçûnê ku bajarê Sileymanîyê di dîroka xwe ya nuh de dîtiye gihast dereca bilindtirîn.

Di tarîxa 25.5. de, 50.000 meriv di rêveçûneke de cih girt ji bo teşîrkirina dîktatorîya faşîst û xwestina cezakirina qatîlên xwendekarên ku grêv kir û ku bi destê polîs hatin kuştin. Rêveçûn bi gelek mirî û birîndar belav bû ji bo ku navbendên "leşkerê geleri"yê faşîst ê Baas ku rêxistineke mîlîsî ye hatin êrîşkirin.

Ji 12.4.84 de, gava ku xwendekarên zanîngeha Selaheddîn li Erbilê (navenda "navçeya otonom" a kurdî) dest bi grêvê kir dijî emrên tedrîba îcbarî di "leşkerê gel" de, tevgera protêstokirinê bilindtir bû û gihast hemî derên din ên Kurdîstanê .....

Li Belçîka jî, di meha hezîranê de, rêxistinên jêrîn daxwuyanîyeke çapê li ser vê bûyerê û li ser rewşa Iraqê derxist:

Partîya Komunist a Libnanê - liqê Belçîka, Piştgirên P.F.L.P. (Enîya Netewî ji bo Rizgarîya Filîstîn), Yekîtiya Xwendekarên Erebian, Partîya Komunist a Iraqê - liqê Belçîka, Partîya Dêmokratîk a Kurdîstan - liqê Belçîka, Partîya Dêmokratîk a Gel a Kurdîstan - liqê Belçîka, Têkoşer (Yekîtiya Xebatkar û Xwendekarên Kurd li Belçîka), K.S.S.E. - liqê Belçîka, Y.X.L.K.E. - liqê Belçîka, Komela Xwendekarên Iraqê li Belçîka - şaxa Gusir, R.D.M. (Koma Dêmokratîka Marokî).

Di eynî zemanî de, li aliyê din ê Kurdîstanê, li Banehê - Kurdîstana Îranê - nêzîkî 600 keş di bin teqîna bomban de, tavil mirin.

Weka ku em dibînin, ji destpêka şerrê Iraq û Iranê heta nuha gelê kurd di her du perçan de du caran tê eşandin. Ji alîkî, ew têkoşîna xwe dijî her du rêjîmên faşîst dike û ji alîkî jî, ji sedemê vî şerrî, xwîna xwe, bê xwestina xwe dirijîne. Bi vî awayî, mercên jîna wî, di her alî de, ango maddî û manewî, roj bi roj girantir dibe. Ne bi tenê pêşmergek mîrxas, lê merivên masûm jî, weka pîr, zarok û jin, bi xwîna xwe û êşa laş û mejîyê xwe, mafên xwe bi zorê distînin û di eynî zemanî de jî, di nav vî şerrê dijwar û pîs de, dibin qurban ji bo faşîstên ku wan dipelîxînin û nahêlin ew bîneke paqij bistînin.

Ev her du rêjîm, weka rêjîmên Tirkiyê û Sûriyê, ji bo vî navçeyê têxin bin destê xwe û destê emperyalîzmê, bi her awayî, ji wan çî bê dîkin û ewê her gav bikin. Loma, têkoşîna me hîn dûr û dirêj e û xebata me, di her warî de, zor û giran e. Serfirazîya me girêdayî dirêjbûna bîna me û rastbûn û fiirehbûna dîtin û xebata me ye.



# REWŞA ÎROYÎN LI KURDISTANA TIRKIYÊ

## Yalçin

Li Kurdistanê fro jîn bûye mucîze, bêkarî, zilm, tedayî, zem; buhabûn jîn kirîye jehr. Ji dema ku Cunta Faşîst hat ser hukmê heta fro, di jînê de her tişt hat guhertin.

Karker gundî (rêncber, cotkar) çûn helakê. Ji xeynî vê yekê jî, perçiqandina gel, êşandin, girtin, ji aliyê leşker, jîna gel hêj reş û tarîtir kir.

Têkoşer ev gomanên (nûçeyên) he ji devê karkerên Kurd ku çû bûn Kurdistanê û gundî, karker û destbikarên (memurên) ku li Kurdistanê dijîn bihîst û ji we, xwendevanên hêja, re pêşkêş dike.

### H.K.:

Ez jî bo tatîlê çûm Kurdistanê. Ew tiştên ku me di kovarên ku ji aliyê komelên Kurd, li ser jîna gel, li ewropa tên nivîsandin, de dixwend jî jînê pirr paşdetir mayîne. Di van çar salên dawîn de kesên ku ne çû bûn Kurdistanê, ewê nema karibin halê (rewşa) gel heyal bikin.

### S.T.:

Ez çûm paytexta Tirkiyê (ANKARÊ). Bertîl (ruşwet) bûye zincîr û xelek bi memurên (karbidestên) dewletê ên piçûk heta ên mezin bi hevduve hatiye girêdan. Kesê ku bertîl ne de nema karê wî di rê de diçe. Bi kurtayî ez karim bêjim ku talane, talana gel e.

### S.N.:

Ez çû bûm ber deryayê (behrê). Jîna burjuwazîya Tirk û Turîstan li ber çavan bû. Şahî, keyf, dîlan, mûsiq û caz jîna behrê hêj renktirîn dikir. Ez ne bawerim ku ev keyf û şahî, zewk û sefa li derekî din ya Dinya me hebe. Li ber deryayê destbikar (memur) ên piçûk jî tune bûn. Ez li wir bi çend kesan re peyivîm; pirr keyfxweş bûn û digotin: bû çar sal, derya pirr merîstir û paqijtir bûye. Ji berê gundî û memurên piçûk yê bê kultur behra me ya zelal û delal şêlû û pêlû Kiri bûn. Pirr spas ji general û Ozal re. Ji bo ku ez bi turîstan re dipeyiv-

vîm, ewan digot ku qey ez ji yekî ji wana bûm.

### R.E.:

Xwer û vexwarina me gundîyan ji berê çar salan ne baş, ne jî xerab, bû. Îro zarokên min birçî ne. Ça, şekir xwerê me bû, fro li me bûye tutya (hesret).

Kêlo ya çayê, berê çar salan 400 banqenota bû, fro 2200 banqenota ye.

Kêlo ya şekir 35 a bû, fro 180 f ye.

Kêlo ya bacan (Frenqî) 5 banqenota bû, fro 100 a ne.

Kêli ya ronî (dohnî) 75 banqenota bû, fro 500 a ne.

Cota pêlav (sol) ji bo mezinan 150 banqenota bû, fro 2000 a ye.

Cil (fîstane) ji bo pîrekan 400 banqenota bû, fro 4000 a ne.

Îkolî goşt 200 bû fro 1000 a ne.

Nanek 15 banqenota bû, fro 60 a ne.

Qelana me ji nêza hat, mala me çûye mîratê, wêran bûye, kes li halê me napirsî.

### L.H.:

Ez memurek (kardibestek) ji yê piçûk ê dewletê me. Ji berya çend salan, her hefte du caran min goşt ji bo gedên (zarokên xwe distand, fro mehê carek bi zorê goştê hestu dikirim. Mehê 35000 drav (maaş) distînim; 15.000 kirê didim, ji bo av, elektrîk, gazê (tûp) jî 5000 diçe, 15000 ji bo 5 kuflet dimîne. Ez û hevalên xwe tev bertîlê (ruşwet) distînin. Amirên ku li ser me, dawîya mehê, serê memur (karbidest) 5 hezar xeraç dixwaze, yê ku ne de wê karê xwe hunda bike. Em tev bûne diz. Dilê min pirr li feqîra û gundîya dişewite, lê bêhtir li zarokên min dişewite.

### S.A.:

Ez xortekî 21 salî me, min lîse xelas kiriye, bû çar car dikevîm fîtihanê unîwersîtê, her sê caran jî min hunda kir. Kar nîne, pirtûk, rojname kaset qedexe ne, nûçeyên hundurî em ji BBC distînin, dan û standin di navbera hevalan de pirr sar bûye. Muxbir (sîxur) zêde bûne.

# DÎROKA KURD Û KURDISTAN

## (V) Derwêş

Di dema ku pêşiyên Selçukîyan, Oxuzî (Oguzlar), ber bi rojava dîhatin (1029) û nêzîkî aqarê Kurdan bûn, di navbera wan de şer' derketin. Di eynî demê de Gazne jî li hemberê Selçukîyan de, di bin serokatîya Mahmudê Gazneyî (Gaznelî Mahmud) de şer' kirin. Şer'kerên Kurdan aliyê Mahmudê Gazneyî girt û pê re, di nav hêza amirhêzê Hacıp Siltan Mesud de cih girt. Lê pêşiyên Selçukîyan, Oxuzî, zora Kurdan jî û ya welatê Gazne jî birin.

Paş ku Selçukî ketin navça Muraxa (1037) û talan kir, çûn ber bi Eşîreta Hazbanîyan. Lê Kurdên li wir, xwe avêtin cem Hikimdarê Azerbeycan û bi wan re li hember Oxuzan şer' kir. Geh Oxuzî û geh Kurd, tev gelên din bi ser diketin.

Di vê navberê de, Vehsuzan bin Mamelan, di sala 1029 de, hikumeta Kurdan li Tebrîzê saz dikir. Ev hikumet destpêka hikumeta Deylem bû.

Paş demekê, di sala 1035 de, hikumeta Şevankârre saz bû. Vê hikumetê 320 salan dom kir. Oxuzî jî di vê navberê de êrîşê dibin ser Kurdan. Vehsuzan bin Mamelan jî hêzeke leşkerî saz kir, û dest bi şer'ê Oxuzîyan kir. Li pir' cihan bi ser ket û tehluka Oxuzîyan jî navça xwe dûr xist. Oxuzîyan, êrîşên xwe li ser Kurdên Diyarbekrê û Musulê Mezintir kirin, talanên mezin û qetlîamên hov pêk anîn. Nasir Bin Merwan-ul Kurd, Oxuzî bi mal ji Diyarbekrê dûr xistin, lê, Oxuzî, paş talan û qetlîamên li Musul û dora wê, ji ber xwe veqetîyan. Amirê Musulê, Karavuş, bi tenê (serokên din yê Kurd û Ereba arîkarina wî ne dikir) ma bû, lê Oxuzîyan jî wira cihê xwe guhazt.

Paş şer'ê ku di navbera Siltanê Selçukî, Alpaslan, û Imperatorê Bizansîyan de çê bû û di nav vî şer'î de imperatorê Bizans, Roma-

nos Dîjenos, qels ket, Kurdistan hêdî hêdî ket bin destên Selçukîyan.

Dewleta Selçukîyan ku aqarê Kurdan û Îran xîşt bin destê xwe di şala 1117 de saz bû. Li beşê Anadoluê jî dewleta Selçukîyan ava bû. Ji wan, ya pêşîn 97, ya duwemîn 230, sal dom kir.

Di vê demê de Kurd, di nav hev da ne bûn yek û li hemberê dijmin şer' xurt ne kir. Selçukîyan wek hemî hêzên din ên biyanî ji dubendîtiya Kurdan fêde kir. Kurdên hevalbendên xwe li hemberê Kurdên ku serî li hember talanê radikir, dixistin meydana şer', yan jî Kurd (şer' di nav xwe bi xwe de) li ser "navçeyên" şer', Kurd li hemberê gelên din rê dikirin şer' (mîna ku Melfî Şahê Selçukîyan, Kurd, li hemberê apê xwe ajotin meydana şer', ji ber ku wî dixwest hikmê dewletê bixe destên xwe).

Paş sala 1134 ê Imadudîn û Tîmurtaş, Amirhêzên Atabegan êrîş bir ser Kurdan û talan kirin. Diyarbekir, eşîra Hamîdiye, keliha Culab û hin navçeyên din di vê navberê de ketin bin van êrîşan.

M. Emîn Zekî, di pirtûka bi navê "Kurdistan Tarîhî", rûpel 75-76 de, qala "dewleta Kurdê Eyûbî" dike. Di wira de dibêje ku eşîretên Hekarîye, Mihranîye, Şehranîye, Mîranîye, Hemîdiye û Zerzarîye û hwd. xwe parastin vê dewletê. Selahedîne Eyubî di dema xwe de ev dewlet pir' xweş kir. Paş mirina Selahedîne Eyubî, dewlet jî ji hev belav bû. Li navçeya Cizîrê jî di vê demê de hikumeta Kurdên Ezîzan saz bû. Bi êrîşên Akkoyunluyan û Osmanîyan ev hikumet hildiweşe.

M. Emîn Zekî, di vê pirtûka xwe de dibêje ku di navbera Kurd û Tirkan de pir' şer'ên mezin yan biçûk çêbûne. Di van demên şer' de gelên ne misilman bê alf (bê teref) mane.



Di sala 1185 de, di navbera Kurdan û Tirkan de (zemanê Xalîfe Nasir Liddîn) şer' du salan dom kir. Di vî şer'î de pir' ji Kurdan qels bûn û navçeyên xwe berdan.

Di sala 1218 de, dîsa Êrîşên mezin hatin ser Kurdan û pir' Kurd hatin kuştin. Çend sal paş de (1225), nexweşî, êş û afetên tebîî ketin nav Kurdên navçaya Dîyarbekrê, Mêrdîn, Riha (Urfâ), Musul û hwd. Van nexweşî û afetên tebîî pir' zexer dan Kurdan.

Di navbera sala 1217 û 1328 de pir' şer' li Kurdistanê çêbûn. Wek her car Kurdistana, bû meydana şer'ê di nav gelên din, (hem di navbera hev û din, hem jî li hemberê Kurdan).

Dema ku Harzemî di sala 1217 de di vî navçê re dibihurin, talanên mezin dikin û di eynî demê de jî li hemberê Abbasîyan şer' dikir.

Herçend e hêza Harzemîyan zû belav bû jî, paş demeke kurt (1225) lawê Şahê Harzemîyan, Celadeddîn, hat ser Kurdistanê. Cihê ku tê re dibihurt kuştin û talan dikir. Di salên 1229 û 1230 de Celadeddîn talanek mezin li dora Musê kir û pir' kes kuştin.

Di vî navberê de Tataran li hemberê Celadeddîn şer' dikir. Û ew jî hêz xist. Her çend e Celadeddîn xwest ku Kurd wî biparêzin, Kurda ew kesê zalim ne parast.

Paş zilm û talanên ku Celadeddîn kirin û çû, Tatar hatin meydana û wan dest bi zilmê kir. Li Dîyarbekrê hewqas kes kuştin û talan

kirin ku Dîyarbekr bû wek bajarekî xerabe.

Me goti bû ku, Celadeddîn revî ba Kurdan û li cihekî starê digerîya. Axayek ji nav Kurdan wî li cem xwe vedişêre. Kurdekî şer'ker, ku birê wî ji aliyê Harzemîyan di şer'ê ke-liha Axlatê de hatibû kuştin, Celadeddîn kuşt. Wî ew bi dizî kuşt, kes xebardar nekir. Lê mixabe, kuştina wî bû sedema Êrîşên Harzemîyan ku li ba Tataran li hemberê Kurdan dest bi talanan kirin.

Di sala 1247 de, Moxolî jî ketin Kurdistana û pir' cih talan kirin. (Dîyarbekr yek ji wan cihan bû). Paş salên 1250 Êrîşên Îlhanîyan dest pê kir. Cidayî kuştina gel, navçeyên Hamedan, Şehresor, Dîyarbekr, Riha (Urf), Mêrdîn û hwd. talan kirin. Di sala 1297 de Hûlagû ket meydana û dest bi kuştin û talana Kurdan kir.

Weka ku tê xuya kirin, welatê Kurdistana, ji hemî alîyan ve bê rawestan ji aliyên hêzên bîyanî dîkeve bin Êrîş û talanê. Ev ne ku kêfa wan hêzên bîyanî ji kirina şer' û Êrîşan re tê û dixwazin gelan bikujin, lê Kurdistana, navçeyêke pir' giring e di aliyê coxrafîk de. Tebîîyet û zengîniya wî welatî ev hêzên bîyanî tema dikirin. Wek giringiya navçê, zengîniya û tebîetê, struktura gelê Kurd di aliyê dewletê de jî pêşda çû bû. Li ser vî yekê dewletên Merwanî û Eyubîyan du nîşe ne. Di wê demê de ev her du dewlet bi hemî tiştê xwe ve ji dewletên dora xwe pêşketitir bûn.

(dûmahî heye)

# TÜRKİYE KÜRDİSTANINDA OPERASYONLAR

Ahmed

Türk ordusu,Şemdinli ve Eruh'taki "baskın" ı bahane edip Kuzey Kürdistan'da yine kan ağlatıyor. 7. Kolordusuna bağlı komando birlikleri tarafından kara ve hava'dan resmi terör'ün uygulandığı, Hakkari' nin Tuzluca ve Hozê köylerini bombardıman edip yaktığı, operasyonların tüm bölgede amansızca sürdürüldüğü sıralarda; Doğu Kürdistan da gerici Humeyni'nin pasdarları toplu bir katliama başladılar.Mahabat bu kıyım maruz kalan kentlerden biri.Bu operasyonda da 200 'e yakın kadın, çocuk ve ihtiyar öldürüldü.

Bunu takiben, Eylül'ün ilk haftasında Arap milliyetçiliğinin mirasçısı Saddam Hüseyin'in başında bulunduğu BAAS rejimine bağlı birlikler de Orta Kürdistan'da "temizlik" hareketına giriştiler.

Bu üçlü kıyım hareketi'nin bahanesi ve se bebi ne olursa olsun, Kürdistan'ı sömürgeleştiren, egemen güçlerin Kürdistan halkına ortak ağır bir saldırı ve sindirme hareketi düzenledikleri açıktır.

Gerçek olan şu ki; bu kıyım ve operasyonları dünya kamuoyundan mümkün olduğu kadar saklamaya ve gizli tutmaya bu üçlü bileşen çalışıyor.Kendi kuklaları basın ve yayın muhabirlerine bile gizli tuttukları bu zalim ve kanlı terördeki amaç; Kürdistan sorununu temelli ortadan kaldırmaktır. Henüz yakın geçmişte Kuzey-batı Kürdistan a saldıran sömürgeci Faşist Cunta kuvvetleri kana doymamış bir şekilde varlığını sürdürme çabasıyla, bütün zorba yöntemlerinden hiç bir şey eksik etmeksizin, yine sınırları aşarak yeni bir saldırıya girişti.Sömürgeci Faşist Türk devleti, böylece tarih boyunca yaptığı zorbalıklar zinciri ne yeni birini ekleyerek, bugün de en içrenç biçimiyle elini halkımızın kanına bu laştırmaktan geç kalmadı.

Yapılan bu saldırı,Orta-doğu'da emperyalizmin jandarmalığını üstlenen yalnız Türkiye Cumhuriyeti'nin değil, aynı zamanda faşist Irak yönetimi gibi çevrelerce de benimsenen,gerekli görülen bir saldırdır.

Bilindiği gibi İran'la savaşmakta olan Irak,uzun süredir ülkenin çeşitli yerlerini ( Kuzey-batısını ) daha fazla kontrolü altında tutamayıp,oradaki bağımsızlıkçı ulusal kurtuluş hareketinin gelişmesine engel olma gücünü gösteremedi.İşte, bundandır ki; Türkiye Cumhuriyetiyle aynı karakterde olan Irak yönetimi kendi ilticacı azgın yöntemlerini tehdit eden bu değişimleri yoketmek veya bastırmak için Türk sömürgeci güçleriyle işbirliği yapmak ve ya-

dım istemekten geri kalmadı.

Bu hücum böylece her iki rejimin aynı sömürgeci sonucu varma gayeleriyle ( ve ülkede sözde aydın,yazar,çizer vb.lerinin eleştirisine uğrayacağını tersine, destek olarak Avrupa Sosyal Demokrasisini de yanına alarak, olaya adete alkış tutarcasına ilgisiz kalarak) dünyanın gözü önünde gerçekleşti.

Orta-doğu da yayılma politikası güden sömürgeci faşist cunta ilk başta kendisine engel teşkil ettiğini gördüğü Kuzey-batı Kürdistan'da gelişen halktan yana örgütlü mücadeleyi hazmedemeyip bölgeye saldırmışken,tarih sahnesindeki gerici karanlık rolünü eskiyi aratmaksızın tekrar yinelemiştir.

Durum böyleyken içerde de en küçük bir mu halefeti dahi ezmeyi gözönüne alan sömürgeci faşist cunta halkın sırtından kırbağını eksik etmeyip,devlet terörü'nü; arama,operasyon,silah toplama vb gibi adlar altında sürdürerek polisi,jandarması ve her türlü gücüyle süresiz devam eden asi milasyonc,sömürü politikasıyla halkımıza kan kusturmaya devam ediyor. Kürt halkının varlığını yoketmeyi ve ortadan kaldırmayı da hedef edinen bu caniler,hayatı yaşanılmaz hale getirip her yanda zulmü katmerleştirip ülkeyi adeta cehenneme dönüştürürcesine,hapishanedeki tutukludan yurdun en üca köşesindeki yoksul köylüye dek baskıyı uygularken emperyalist emellerine daha çabuk varma amaçları gütmektedirler. Ama Kürt halkı bünyesinde koruduğu dili, kültürü vb gibi yapılarıyla bunları boşa çıkaracaktır.

Tarih,zamanın iz bırakmaksızın geçmediğini göstererek,ergeç zulmün kalelerinin yıkılıp,halktan yana aydınlık,güzel günlerin geldiğini ıspatlamıştır.Nihai zafer Sömürgeci Faşist Cunta'nın uygulamalarına boyun eğmeyerek,idam sehasında,işkence odalarında,dağ başlarında savaşarak şehit düşenlerin anılarına bağlı kalacak Kürt halkımızın örgütlü mücadelesiyle gelecektir.

Kürdistan halkının haklı mücadelesini sömürgeci Faşist Cunta durduramaz. Zafer ezilen halkımızın olacaktır.

Ji redaksiya Têkoşer'ra

Hevalên heja!

Heta niha min bala xwe da xebata we. Û min hemû hejmarên Têkoşer xwend, di alfiye çandeyf û netewî da gelek xebatên giranbiha li Belçîka bi çfî anfn. We di warên çandeyf, êde-bî û di xebatên netewî da pîroz dikim. Serfirazf û serketina we dixwazim.

Bi silavên welatparêzî.

## Jîyan

### SONDA DOZA ME

Li ser me ronahîya hîvê  
Binê wê da dimeşîyan wek masîyên bin avê  
Bêdeng bû, çixsayî bû,  
Histêrkan bi hevdû dilist vê nivê şevê da  
Em ketin bin êvrê reş û sipî  
Hev tenê çir-çira teban  
Û dengê gurên birçî ser me da diçû  
Hemû karvan dimeşîya li ser êrdê sor  
Tenê dengê pîyên wan bû  
Dayika min  
Dengek bêbext di yek carê da  
"Vurun ateş serbest!"  
Ew egîr û merdên piling  
Bi êrdê va hîmê diweşîyan  
Û

Wek baranê bi ser me da gule direşandin.  
Dîsa hemû wek stûnek darê radiwestîyan (duruyorlardi).  
Wekî govendek girover ava kiribûn  
Wekî di davêtê da bin  
Yek deng û yek awazek  
Li nav zinar û daristanan de belav dibû  
Dengê wan.

HILWEŞE METINGEHKARI, BIJÎ SERXWEBÛNÎ  
Bi wan dengên har dibûn ew lawên wahşa,  
Kes ji tirsî bi semta me nêzîk nebûn,  
Heta jîyana me ji qefesa canê me derket  
Dîsa jî tirsî me di dilê wan dê bû  
Wekî, me wan kuştibû  
Dilê wan di devê wan avêtibû  
ERE DAYIKA MIN.  
Hêvî ya kulîlkên te wanî qurmiçandibûn  
Û

Lawên te ûsa barkiribûn ji cîhanê  
XWÎNA ME

Û xwîna me tovên nuh avdida  
Ji tirsan me avêtin nav çem û golan  
Û wek bayêk henik dîsa kuşîna me bi dara ket.  
WEK GULÎLKEN BERFÊ LI ERDE SIPI DIKIR  
Û SOR Û SORBÛNA ME DÎSA WEK HEVÎ RONAHI DIKIR.

# KURDISTAN, ÇEND

## ABORÎ Û

### II-TEVGERA ÇANDA KURDÎ DÎ SEDSALA XX'A DE

#### HETA SALÊN 1960

#### A-Kurdistana Tirkîyê

Rêzana (sîyaset) assîmîlasyonê a hukûmeta Tirkîyê xebata Kurdan ji bo pêşvebirina bêjeya xwe xeniqand. Li gel vê qasê, ev xebat bi dizî dajot. Alfabeyên kurdî, li her mizgeftan dihatin firotin. Dîwane-ke helbestan li Diyarbekrê hat weşandin.

#### B-Kurdistana Îranê

Hukûmeta Iranê, çî qas rêzana xwe ya assîmîlasyonê bajota jî, ew, di tarîxa 6.5.1959 de, îzn da derketina kovara bêjeyî û agahdarî "Kurdistan" (bi zaravê Sanandajê), li Tehranê. Lê, hejmarên vê kovarê pirr hindik bûn û di navçeyên Kurdistanê de ne dihatin firotin. Bi tenê dibistaneke kurdî hebû, lê di zanîngeha Tehranê de kursikî kurdî jî hebû.

#### C-Kurdistana Îraqê

Piştî şerrê 1919-1920 û şûn de, tevgera çanda kurdî pirr pêş ve çû. Xwendayên kurd ên Tirkîyê xwe gihandin Kurdên Îraqê. Her du navendên çandîyên kurdîyên mezin, Sileymanîye û Begdad bûn. Eserên ku di van salan de derketi bûn ev bûn:

K o v a r (hefteyî, mehî, ....):

- Li Begdadê: Diyarî Kurdistan, Gelawêj (1939-1949), Denge, Gîtuje, Taze, Nizar, Dengê Kutabrijan (organa xwendekaran). Xebat (organa Partîya Dêmokratîk

a Kurdistana Yekbûyî) (heta 1961), Rizganî, Ronabî, Azadî (organa Partîya Komunîst a Kurd).

- Li Sileymanîyê: Pêşkewtin, Bangê Kurdistan, Rojê Kurdistan, Bangê Haq, Umîdî Istîqlal, Ziban, Zanîstî, Zîm.
- Li rewandûzê: Zarê Kurmancî
- Li Erbilê: Hewler (ji 1936 û şûn de)
- Li Mûsilê: Rastî

Pêwendîyên ku bi bêjeyên biyanî, erebî û ewrupî, re di bûn, bêjeya kurdî firehtir kir: eserên zanîstîyê, çfrokên gerran (siyahet) li Kurdistanê, ku bi îngilîzî hati bûn nivîsîn, bi hêzanî ên Millengen, Rich, Hobard, Johnson, Freya Stark, yan jî çfrokên ku ji kovarên erebî hati bûn stendin, bi zîmanê kurdî hati bûn wergerandin.

Rêzimanên kurdî hatin weşandin:

Destûrê Zîmanê Kurdî (Begdad, 1929) ê Tewffîq Wehbî. Eladîfî Sîcadî jî rêzîmana xwe di sala 1948 de, li Begdadê, weşand.

Ferheng: Gêw Mukriyanî ferhengeke erebî-kurdî, bi 35.000 gotin, weşand.

Dîrok: Salih Zekî Sahîbqîran gelek nivîsaran di kovara "Diyarê Kurdistan" de, li ser merivên mezin ên Kurdistanê, weka Seyîd Huseyn Mukriyanî, Mehmed Emîfî Zekî, .... nivîsî.

Cografya, bêje, helbest:

- Heta 1958: nivîsarên kurdî pêwîst bû ku bêjeyî û dîrokî bin. Her gotinek li ser pîrsên rojî (actualité) qedexa bû.



# NOT LI SER JÎNA

## ÇANDÎ (II)

Pervîn

- Ji 1958 û şûn de: Kurd mafê serbestpeyvîvîne stendin û daxwaziyên xwe yê netewî venediştartin.
- Piştî derba Temmûza 1959: nivîskarên kurd li ser "Komara Dêmkarîk a Kurdan û Ereban" nivîsîn, ji bo ku xeyala derewîn a biratîya Kurd û Ereban ji aliyê rejîmê Iraqê weka bingeha hukûmetê bi xwe dihat nîşandan. Gelek dibistan û zanîngeheke kurd ji aliyê Idareta Hînkirina Netewî ji bo Kurdistanê vebûn. Komîsyoneke ji şeş endam bi kurdî û erebî pirtûkên li ser dîrok, cografya û bêjeya kurdî nivîsî. Van madan ewê, tevî hînkirina zimanê kurdî, biketana nav bernameyên dibistanên Iraqê ên erebî.
- Ji 1961 û şûn de: bi destpêka şerr dijî Berzanî û daxwazîya otonomîyê, pelixandina Kurdan û çanda kurdî dest pê kir.

### D-Kurdistana Sûriyê

Piştî tevgerên 1930, li Kurdistanê Tirkîyê, Kurd tecrube kirin ku ziman û bêjeya gelexî pêş de bibin. Birayên Bedir Xan, bi hêzanî, Mîr Celadet û Kamuran, li Kurdistanê Sûriyê bi cih bûn û dest bi vê xebatê kir. Organa wan kovara HAWAR bû. Bi kurdî û fransîzî dihat weşandin. Ji sala 1932 heta 1935, û paşê, ji 1941 heta 1943, derdiket. Di dawîya kovarê de ji çend rûpel, bi wêne, bi navê "Ronahî" jî hebûn. Mîr Kamuran Bedir Xan gelek salan zimanê kurdî di Dibistana Netewî ya Zimanên Rojhilatê ên Iroyîn, li Parîsê, hînkir. Esera wî pîr giring e: çîrok: "Qralê Kurdistan", "Dilê kurê min", .... Di sala 1953 de, rêzimana xwe "la langue kurde" (Zimanê Kurdî) weşand. Celadet Bedir Xan, piştî lêkolîneke pîr hêja li ser zimanê kurdî û ku 20 salan ajot, bi hevalê xwe yê fran-

sîz, Roger Lescot, re "Grammaire Kurde" (Rêzimana Kurdî) nivîsî. Ev rêzimana giranbiha di sala 1970 de hat weşandin.

Li dora Hawarê nivîskar û helbestvanê cuhan civîya bûn. En bi nav û dengtirin vana bûn: Mustafa Ehmed Botî ku bi fablên xwe (çîrokên lawiran) hati bû nasîn. Qedrfî Can, helbestvanekî nûjen ku çerçeviyên kevn berda bû. Osman Sebrî û Melle Ahmedê Heyderan. Ji hemûyan bi nav û dengtirin Şêxmûsê Huseyn ku bi navê Cigerxwîn hatiye nasîn e. Wî, diwana xwe ya yekemîn "Diwana Cigerxwîn", di sala 1945 de weşand. Helbesta vê diwanê qîrînek e ku Kurdan daf dide ber bi yekîtiyê û têkoşînê dijî belengaziyê û nezaniyê. Di sala 1954 de: diwana Sewra Azadî. Wî pirtûkên rêziman, aheng û dîroka kurdan, bi helbest, jî weşandi bû. Di van salên dawîn de ew li Swêdê dijî û gelek diwanên wî yê din jî derketine.

### E-Li Sovyêtistanê

Li Sovyêtistanê, ziman û bêjeya kurdî di helbest, çîrok, romanên.. de, bê tirs, pêş ve çûn.

Nivîskarên kurd ên Sovyêtistanê en bi nav û dengtirin ey bûn: A. Samflov, A. Gindî, Lazo, Qaseke, Mîrad, W. Nadîrî, Siras, Qenatê Kurdo .....

Piraniya eserên wan li Erivanê, paytexta Ermenîstanê, hatine weşandin.

#### Çend tarîxên giring:

1922: zimanê kurdî bi alfabeya ermenî a hinek guhertî dihat nivîsîn.

1927: alfabeya latînî ji aliyê Aîsor Margulev û nivîskarê kurd, A. Samflov, hat danîn.

1928: danfina resmî a alfabeya latînî.

1944-1945: alfabeya kîrîlî ku ji 39 tîpan ava ye (neh bi deng û 30 bê deng) cihê alfabeya latîni girt. Ev alfabeya nuh ji aliyê akademîsyen Kapakjan û A. Gindî hat danîn.

Qenatê Kurdo di "Grammatica Kurdo-kokogo Jazyka", di tabloyeke de, muqayesa çar alfabejen kurdî: latîniya sovyêtiya 1927, kîrîliya 1945, latîni û erebî, kirin.

Ji xeynî nivîskaran, gelek lêger û zana hene. Kurdolojîya Sovyêti li Mosko û Leningradê jî pêş ve diçe. Di destpêkê de, pirtûkên dibistanîyên kurdî ji aliyê kurdîzanên ermenî, weka T. Maragulev û R. Drambjan ..., dihatin nivîsîn. Lê, ji sala 1936 û pê de, ev pirtûk ji aliyê nivîskarên kurd, weka Emîn Avdal, W. Nadîrî ....., hatin weşandin. Piştî şerrê cihanê ê duwemîn, du rêzimanên dibistanîyên pîrr mukemmel, li Erîvanê, ji aliyê Qenatê Kurdo, û li Mosko ji aliyê I. I. Tsukerman, hatin weşandin.

### III - DÎ SALÊN DAWÎN DE

Rêzana dirêj û dijwar a pelixandin û assîmilasyonê ku her çar hukûmetên Tirkiyê, Iranê, Iraqê û Sûriyê da jona çî qas hov be jî, ziman, çand û bêjeya kurdî xwe dijî wê parastine û, dêlva ku bimrin, agirê xwe, hêdî hêdî, diçirîsînin. Ew, di her warî de: di pirtûkên hînkirina zimên, ên dîrok û bêjeyê de, di rojname, kovar û broşurên kurdî de, bi gawên piçûk, lê bi xwe bawer, pêş ve diçin.

Ev îsbat dike ku hişyarbûn û xwestina gelekî ji pelixandin, talankirin û kuştinê pîrr xurttir û dijiwartir e.

### OLA (DÎN) KURDAN

Keşeyê fransîz, Thomas Bois, ku jîna olî û çandî li Kurdistanê ji nêzik de kolaye, di kovara Proche-Orient Chrétien, Amman-Urdun, de dibêje: "Kurd perçeke giring (...) lê ku baş ne hatiye nasîn, ji gelên misilman in. Ew di nav Irana şîfî, Tirkiya hinek layîk û erebên

Iraq û Sûriyê ên sunnî de hatine asêkirin. Li vê derê, em karin bêjin ku di vê çaryana îslamê de ola Kurdan çend aliyên (sîfetên) wê ên xusûsî hene ku Kurdan ji cîranên wan vediqetînin û ku heta nuha ji aliyê gelek kesan ne hatine zanîn".

### Berê Îslamê: ZERDEŞTÎ

Ola Medan Mezdî bû. Mezdî, bavûkalekên Kurdan bûn û li Kurdistanê, di sedsala hefta, berê mîladê, de bi cih bû bûn. Qralîya wan di sala 549, berê mîladê, de ketî bû bin destên Farîsan. Navê xwedêyê wan ê mezin Ahura Muzd bû. Ango, "Xaliqê Mutlaq", yan "Mezinê Hekîm". Li tenîştî wî xwedêyên jê piçûtkir hebûn, weka Mitra, xwedêyê tavê..... Anahîta, xwedêya avê, zabûnê..... Mezdî jî hemû hêzên tabîyetê re îbadet dikir. Pîrên wan ji xwedêyan re qurbanan şerjêdikirin û agirê muqeddes di odeke bilind, di mabedan de bê rawestan, geş dikir. Ev Pîr du bawerî nas dikirin: Qencî = Hurmuzd û Pîsîti = Ehremen;

Zerdeştî vê ola mezdî paqij kir. Ew di welatê Mukrî de, li Kurdistanê Iranê, di sala 660, berê mîladê, de hati bû dinê. Gotinên wî eserên bi aheng bûn û di pirtûka muqeddes, Avîsta, de hati bûn nivîsîn. Zerdeştî, çend bawerîyên mezdî, weka di merasîmên dîni de şerjêkirina qurbanan û vexwarina şerabên ku meriv serxweş dikin, avêt. Lê, prensîpê agirê "sîmbola edaletê û têkoşîna dijî hêzên pîsîtiyê" (1) hişt.

Bawerîya wî ya giringtirin ev bû: her meriv pêwîst e ku ji nav bera ronahî û tarîtiyê, Qencî û Pîsîtiyê (Hurmuzd û Ehremen) bibijêre.

Morala wî, bi kurtî, ji van sê prensîpan ava bû bû: "Fikra Qencî, Peyvên Qencî, Kirinên Qencî". (2)

Zerdeştî qenciyê ji bo lawiran jî nesîhet dikir. Ji sala 224, piştî mîladê, û şûn de, zerdeştî bû ola resmî a Farîsan û heta îşgalên misilmanan, di sala 642, piştî mîladê, de ajot.

Giringî û mezinbûna ola zerdeştî ew e ku bi prensîpê xwe ê zo (Qencî dijî Pîsîti) tesîreke pîrr me-dûmahî rûpel 31

# TÊGÎHEŞTÎNA ÇÎROKÊN GEL

## II

Torî

### Daxwîyana gel

Di çîrokên me de xelk bêdeng e. Axa, beg û mîr dibêjin rabin, ew dirabin. Berê wana didin şera. Di şeran de weke şeran pevdîçin. Yan dikuvin, yan jî tîn kuştin. Bi kurtayî, her tişt li gora daxwazîya wan kesan çêdibin. Di şeran de navê xelkê egîd, fêris û pehewan in. Divegerin gundê xwe, dîsa bêdeng in. Di tangayîyê de bitenê dengê axîn û ofîna wana tê. Dê dîsa ne bêdeng in. Xwe bi tevgera, bi kesna ji xwe dane nasandin. Bi wan tevger û kesan em hêza gelê xwe dibînin. Ew jî yekî-tî û tevayîke bêdengî ye. Vêna di çîrokan de xweş didin der. Bi sadan kes, li buwarî kesekî dikevin şer. Bi kuştina axa, beg an mîrê wan, ew bi sadan kes xwe ji şer didin alîkî. Ev tevger daxwîyana yekbûyîna bêdeng e.

Di çîrokên me de gelê me, bi tevayî bi kesna ji xwe beşdarî çîrokan dibin. Ew kes mazinê êlê, xulam, jin, pîremêr an pîrejin in. Em bi wan kesan di çîrokan de têgîheştî ya gelê xwe dibin. Hizira "düşünce" wan, hizira gel, tevgera gel bixwe ye. Dema ko dora gotinê gihasta wan an hizira wan tîn pîrsîn, ya xwe dibêjin.

Nîşe :

Dibê çar deh hazar konê êla Ehmed begê, maqulê zozana jorîn wê ziviztanê li deşta Rihayê, gel Tahir begê, mîrê deşta Rihayê man. Beharê riya zozanê jorîn girtin. Di rê de liqayî deşteke bûn. Deşt ji gul, nefel û endeko xemilîye. El derhal konê xwe berdan erdê. Heywanê xwe berdan nav vê şînayîyê. Tu nabêjî ew deşt, deşta Usif begê, maqulê deşta Homanê ye. Vê rojê Usif begê û xulamêkî xwe ji bajarê Homanê derketin e ko serik li koçerê xwe yî deşta Homanê bidin. Qederekê diçin. Ji dûr ve çavê Usif begê li êla Ehmed begê dikeví. Usif begê bihêra li xulamê xwe dizivirî :

- Gelo, dibêjî. Ev konê ko bê

destura me û bi darê kotekê, bi darê zorê li erdê me danfne, kî ne ? Zû here ? Benê konê wana bibire, kona berde erdê. Bê kî ji wana qebl nakî, bere bê em wî kesî bibînin. Nasbikin bê çî mîrxas e.

- Begê min, dibêjî xulam. Wî tu dibîni, kesê hatî bi hejmara nayên hejmartin. Weke mij û morane. Ev ne konê feqîrekî ne ko ez herim benê konê wana bibirim û berdim erdê. Hege kesin xerîb û rêwîngî bin, emê bêjine wana. Bere konê xwe rakin û bi riya xwe de herin. An ne, emê bi zorê bi wan bidin barkirin.

Ev gotina xulam dikeví serê Usif begê. Xulam xwe digihênî konê Ehmed begê. Daxwazîya Usif begê dibêjî û heta êvarî mohletê didî wana û divegerî. Ehmed begê mazinê êlê di bin konê xwe de dicivênî. Tiştê kirinê ji wana dipirsî.

- Malava, dibêjin mazinê êlê. Em hatin cihekî weke cenetê. Ti deverekî din wilo nakeví destê me. Em ji vir narabin. Hema çî ji destê wî tê, bere bikî. Dema ko vegeyîyan, emê bi maqulîyê nêzikayî bidinê. Qedra wî bigrin. Emê bi xweşî bêjinê. Ko bi xweşî nekir, emê bi darê zorê li vir bimînin. "ji çîroka Ehmed begê û Xalit begê".

Weke ko li jor hatî berxistin, em di çîrokê de du bersivê pîrsa dibînin. Di herdu bersivan de em pêşî aştîxwazîya gelê xwe dibînin. Berî her tiştî xweşî. Piştra li-berxedan. Ya rast jî ev e.

Demin tîn bûyerin tîn kirin. Kesin bi wan bûyeran êşîyan e. Gelê me li buwarî wan bûyeran bêdeng namînin. Pîremêrekî, pîrejinekî an jinekî derdixî holê. Dengê xwe bi wan kesan didî der.

Nîşe :

Dibê Ehmed begê keça xwe yî bider-

gistî daye Usif begê, maqulê deşta Homanê. Yek ji êla Ehmed begê, imrê wî gihaye heftê salî. Ocdan û ihsafa wî qebul nakî. Di rabî bozekî seglayî ji tawla haspa derdixênî, di qulibî ser pişta bozê seglawî.

- Bi soz û qerara xwedêgdibêjî kalê êlê. Ezê berê xwe bidim welatê Rihayê. Ji Xalit begê ra bêjim, ev ne bext, ne ocdan û ne dîn e. Ev îroj heft roj e, şiraniya Gurca Muşê vexwarin e. Ev heft roj in Gurca Muşê qehwe li odê de ji Usif begê ra digereînî. Bi navê xwedê kesî hesabê xelata te nekir û ne qala te kirin. "Ji çîroka Ehmed begê û Xalit begê".

Nîşe :

Dibê wê rojê darê agirê qehwa odê qedîya ne. Bersêl axa her yek barik dar ji kesê civata xwe dixawzî. Dêhtira rojê her kes barê darê xwe tênî. Yek ji caytê barê darê xwe nayênî. Ew jî wê rojê ta bi qirika milê wî girtîye. Nikaribû de harî barik dar ji çiyê bê-nî. Bersêl axa li wî kesê êtim dixazibî. Xulamê xwe dişiyenî. Wî dixin nav merşekê û tînin ber Bersêl axa dideynin. Bêrsêl axa êtim diavêjî bin lingê xwe û heta ko di dev û lêvê wî de xwîn biavêjîdî ber dara. Xeber didin dayîka wî pîr. Pîrê tê bi darê Bersêl axa digrî, de hew li kurê wê bixî. Bersêl dizivirî dar kê li pîrê jî dixî. Pîrê divegerî Bersêl.

- Lawo, dibêjî pîrê. Hege tu ji maleke baş bana, tu kurê Ehmed axayê millî bana, rayik ji mala paşayê millî bi tera hebana, te destê xwe li me hilnedida. Lê lawo ew dêlika diya te, te ji ber kîjan dar û devîya girtî, tu dirabî vana li me dikî. "Ji çîroka Ehmed axayê millî".

Nîşe :

Dilê gelê me ji şera gelek şawitî ye. Dem nebihuriye ko gelê me ne ketibî şer û binê erdê bi sadan fêris, egîd û pehlewana neyên da-girtin. Em di nav van şeran de liqayî yekî nabin de li gora daxwazîya gelê me bibî. Hemû şer di nav eşîrê Kurda û ji bonî parastina mafê axa, beg û mîra hatine kirin. Gel bê dilê xwe çûye van şera. Em vê bédiliyê di çîrokên xwe xweş dibînin.

- Xulam, got Gurca Muşê. Berê xwe bide welatê Homanê. Usif begê, maqulê deşta Homanê bibîne. Bê Xalit begê, dergistîya



te Gurca Muşê ravand. Nûha Xalit begê û birayê dergistîya te Hesoketine şerekî giran. Hesoketîye halekî xerab. Bere bi heware giran bê hawara birayê min Hesoketîye.

- Xatunê, dibêjî xulam. Ez hêvî dikim de herdu bimirin, xelata yekî nemînî. Hege tu ramusenekê ji wê gerdana bedew nedî min, ne birayê te, eşîra mala bavê te biqelî, ez naçim. Ya min kîjan axa bî, ez li kurtela nanê xwe dimeyzênim. Ti karê min ji wana nîne. "Ji çîroka Ehmed begê û Xalit begê".

Nîşe :

Dibê Mihemed begê mîrê Bohta kuştina xulamê xwe Muso daye ber çavê xwe. Lê destê wî nagihî milê Muso de wî bikujî. Dibê tev axa, beg û gîrgîrê Bohta li oda xwe civandîye. Şewra xwe li kuştina Muso danî ne. Ev şewr digihêjî guhê jina Mihemed begê an biçûk Xanimê.

- Bi xwedê, dibêjî Xanimê. Muso gelek cara mêr ji me ra kuştin e, terş ji me ra vegeandî e, û gelek qencî bi me ra kirîye. Bi xwedê ez vê bi Muso nakim. Ezê xeberê bidimê. Ji hemu şeva bere îşev Muso neçî oda Mihemed begê. "Ji çîroka Muso".

## Rewşa jina

Dema ko em li navên çfiroken xwe di-mezyênin, em dibînin ko gelek çfirokên me, bi navên jinan hatine navandin. Weke : Seyrê, Fatima Salih axa, Menca Elîyê Sêlim axa, Narencîyê, Xezala Kurda, û Çîçeka Cîfî. Hin çfirokên me jî bi navê mêr û jinan hatine navandin. Weke : Sîyamend û Xecê, Mem û Zîn. Ev rewş nîşe me didî ko jin di çfirokên me de cihekî giring digrin. Jin di çfirokna de bixweser kesê çfirokan î yekemîn in. Bûyerên wan çfirokan li do ra wan jinan dizîvirin. Weke : Seyrê, Fatima Salih axa, Menca Elîyê Sêlim axa û Çîçeka Cîfî. Di çfirokna de jî, jin kesê çfirokan î duyemîn in. Bi kesê çfirokê î yekemîn ra di çfirokê de cih digrin. Weke : Sîyamend û Xecê, Mem û Zîn, Xezala Kurda û Narencîyê.

Tevayîya van jinan ji malbata axa, beg û mîran in. Keçê wan, Xuhê wan an jinê wan in. Weke Meryem Xatun, carna jî ji xelkê ne. Gelê me hizira "dûşûnce" xwe yi di di derheqa jinan de, bi van kesa daye der. Em di çfirokên xwe de jinan, nemasa keça, di sedeman de, nemasa di biryara derheqî wan de serfiraz dibînin.

Nîşe :

## Daxwazîya evîne

- Elî, dibêjî Seyrê xatun. Ji welatan, bajaran, miluk, axa, maqul û paşa têne min. Birayê min dibêjin asil xuha me ye. Ez dibêjim nûha mêr nakim. Qey xwedê hêj nasib nekiriye. Çawa gava din çavê min li te ket, ne bi dilekî, bi hazar dilî, dilê min kete te. Ko tu qayil bî çaroxa te qayilim. Ji xeynî te mêr li livîna min heram bî. "Ji çfiroka Seyrê".

Nîşe :

- Şivano, dibêjî Fatim. Serê min û pîra diya min lê qurbano. Dema ko bibî êvar, were kona min. Hege tu li ber mele û şêxê islamê nerûnî, bere heta terqîna sibahê sing û berê min helalî te bin. "Ji çfiroka Fatima Salih axa".

Nîşe :

- Ehmed axa, got Meryem xatun.

Bi xwedê dilê mi kete te. Lewma ez pirsax ji te dikim.

- Va gotîna nebeje min, got Ehmed axa, Ji min ta şexm e.
- Qet netevgere, got Meryem Xatun. Bi xwedê tu ji min ne çêtirî. Hege tu min biravênî, biravêne. An ne ezê qebhekê bînim serê te ko piçê te bixin biqasî guhê te. "Ji çfiroka Ehmed axayê millî".

## Rewşa bav û bira di

### derheqî keçan de

Em di çfirokên xwe de bav an birana binînin, di biryar danê de keç an xuhê xwe ji binî serbest dikin, an biryara wana dixin mercê biryara xwe, an jî wana girêdayî xwe dibînin, bi kurtayî, wana dixin sedemê bazarê.

Nîşe :

- Ji welatan, bajaran, miluk, axa, maqul û paşa têne min. Birayê min dibêjin, asil xuha me ye. Ez dibêjim, nûha mêr nakim. "Ji çfiroka Seyrê".

Nîşe :

- Dema ko te Xezal bir, got Ehmed axayê Mendêlî. Min û te heft sala binê zikê erdê ji hevdu dagirtîye. Hema ko te bir û Derwêş axa qabul nekir, wê hingî şerê me dom bikî û wê destê me di barstika hevdu de bî. Yan ko Xezala Kurda got, ez Derwêş axa navê, careke din emê rahêjine hevdu. Edî tu here xwarzîyê xwe Derwêş axa bişîyêne bin kona min, bere çend roja li vir bimînî. Ko ew û Xezala hez ji hevdu kirin ez soz didim, ezê Xezala Kurda bixemilênim, li piştê Derwêş axa suwar bikim û bişîyênim. "Ji çfiroka Xezala Kurda".

Nîşe :

Dibê Tahir begê, mîrê deşta Rihayê, Narencîyê ji bavê wê Derbas axa dixwazî.

- Lawo barê min gelek giran e, dibêjî Derbas axa.
- Barê te çî ye ko giran bî, dibêjî Tahir begê.
- Serê mala êlê tê mehinek kihêl û tîfîngêkê diyê. Heft kurê min hene. Tê her heft kurê min bizewicênî. Tê elbik perê zêr bi-



dî min. Nêr û mê tê sad heywanî bidî min.. Ew ker, ew hasp, ew çî bî, hemu sad sad.

- Way li ser serê min û bavê min, dibêjî Tahir begê.

Dibê qewlê xwe bikaranîna wan tiştan kirin. Tahir begê dest pê kir. Di hikmê sê mihan de deşta Rihayê jê ra talan kir. Destê feqîra kir bin çengê wana û tiştik bi wana kir ko nehatî kirin. "Ji çîroka Tahir begê û Ehmed begê".

Em bawerin ko çîrokên me, di vê sedemên de jî, biqasî ko tiştik li gotinê nemînf zelal in.

## Liberxwedan û serhildana jinan

Em di çîrokên xwe de gelek caran jin an keçê xwe di serhildanê, di liberxwedanê de dibînin. Serhildan bi tevayî li buwarî bédadîya ko li kesna din tên kirin de, "nîşa ji çîroka Ehmed axayê millî û ji çîroka Muso li jor hatî dayin. "Liberxwedan, li buwara biryara ko derheqî wan de hatî dayin de ye. Di herdu sedeman de jin an keçê me sipartinê "görew" xwe bi cih tînin.

Nîşe :

Dibê Gurca Muşê dergistîya Xalit begê, mîrê deşta Rihayê ye. Bavê wê Ehmed begê divê ko Gurcê bidî Usif begê. Dema ko Ehmed begê biryara xwe gote Gurcê.

- Yabo, dibêjî Gurcê. Qet ev tişt nabî. Ez cilê xwe yî bukanîyê

li xwe nakim. Na rahêjime misî-nê qehwê. Fincana nadeynim ser tilihê xwe yî hinekirî. Ez nayê rexê odê û qehwê li ber Usif begê, maqulê deşta Homanê nagerînim. Ez dergistî pismamê xwe Xalit begê, mîrê deşta Rihayê me Mala te li mîratê bigerî. Ma ne te soz û qerara xwe dabû Xalit begê. Ev çî tofana e ko tu min rojekê didî yekî, ji yekî dibitînf. Ev ji min ra gelek eyb û kêmanî ye. Bar barê namusê ye yabo. Qet ev tişt nabî. "Ji çîroka Ehmed begê û Xalit begê".

## Parastina malbat û eşîran aliyê jinan

Rojin tên serêkên eşîrê an êla ji serê eşîra dûr dikevin, an bi tevgerne xwe çewtîna dîkin. Em di vê sedemên de jî jin an keçna di parastina eşîr an êlan de dibînin. Heyîna xwe li wir jî nîşe didin.

Nîşe :

Dibê Menca Elfiyê Sêlim axa, malê wana giran e û heft birayê wê he- ne Kikî paşa, paşayê dewletê rojê- kê tê bajarê Mêrdînê, dibî mêhva- nê mala Elfiyê Sêlim axa. Çavê wî li Menca Elfiyê Sêlim axa, xuha heft biraya dikevî. Dema ko çavê wî li Mencê ket, bîra xwedê û pê- xember hew kir. Rabû Mencê ji heft birayê wê xwest. Birayê Men- cê î biçûk xwe ne da ber dana xuha xwe. Ser vê yekê Kikî paşa hat xezebê. Destê heft biraya li ke- lemça, situwê wana li lala, lingê wana li qeyda xistin. Avêtin ser qantira û birin bajarê Diyarbekrê. Avêtin binê zindana xwîniya. Men- cê ma sebaba her heft birayê xwe.

Dibê Menca Elfiyê Sêlim axa, dêhtî- ra rojê, bi zeraqa sibahê ra, bi cêrîke xwe ve, rabû çû gel Kikî paşa, walfiyê bedena Diyarbekrê. Xwe avêt Kikî paşa. Lê Kikî paşa ji daxwazîya xwe nevegerîya. Men- cê li Kikî paşa zivirî.

- Paşawo, dibêjî Mencê. Birayê min ne mêr kuştin e, ne mil fi- ran dine. Te wana avête binê zindana xwîniya. Ez nakevim ber girtina heft birayê xwe. Girtin girtina mêra, qeyd xilxalê şêra ye. Lê sifra mala bavê min gi- ran e. Ev çend rojin derfiyê ma- la bavê min miqabilî neyara gir- tî maye. Ez li ber vê dikevim. "Ji çîroka Menca Elfiyê Sêlim axa".

# KOMELA KARKERÊN KURDÎSTAN

Baselerplatz 6

6000 Frankfurt am Main 1

tel 0611-23-18-40

**Îlon 24, roja duşemê seet 20 ê êvarê**

## **VEBÛNA HEFTÊ ÇANDA KURDÎSTANÊ**

Derheqa heftê çandi da informasion, bi film û dia qala kurda û welatê wan, bi girani sala isal (1984) rewşa Kurdistanê çiyê çî nine tinin ber çavan. Berpirsiyarên komela axaftinên piştgirtiyê dikin û sazband şêxo kilaman dîstirê.

**Îlon 25, roja sêşemê seet 19 ê êvarê**

## **LÎTERATUR - HUNERÊN DESTA - XWARÎN**

M. Ararat, Literatura kurda devkî û nivîsi qal dike. Helbestvan Dewran, ji pirtuka xwe bi navê "EUPHRAT" helbestên xwe dixwîne. Nivîskar Huseyn Erdem, ji destana Siyabend û Xecê birekî dixweyne. Gundî, helbestên xwe pêşkêş dike. Di vê êvarê da hûnerên desta (gelt, xalîçe, gore, kulik û tiştên din) tî naskirin. Xwarin û vexwarina kurda tê naskirin.

**Îlon 26, roja çarşemê seet 20 ê êvarê**

## **TIYATRO BÎ WELATÊ MÎN RA GÎL Û GAZÎN**

Di vîlistikê da qala erîşên ser Kurdistanê kevn (Moxolan, Selçukan, Persan, ...) dibe. Perçebûna Kurdistanê, evina kurda, hesreta dilê wan, êşên wan û birinên wan dibe. Bê guman hêviya gelê kurdî vê şanoyê (tiyatroyê) da ciyekî berbiçav digrê.

**Îlon 27, roja pêncşemê seet 20 ê êvarê**

## **MUZÎKA KURDA KLASİK Û NÛJEN**

Çavkaniya muzika kurda, enstrumentalên wan, cudatiya di nav muzika kurda û muzika ciranên kurda da tê eşkerekirin. Bir bi bir kilamên dila, yê hesretê, durketinê, xebatê, kilamên govenda, kilamên şîna, yê politik û yê din tinin naskirin. Cih bi cih hikayetên kilaman pêşta tê gotin û piştra kilam tî strandin wek Hesenik û Asê, wek Evdalê Zeynê. Di êvara muzika klasik û nûjen da keçik-bûk û xortên Komela Karkerên Kurdistan û Kemal û Delal cih digrên..

**İlon 28 , roja inê seet 20 ê êvarê**

## **SERGIYA WÊNEKÊŞAN**

Sêrgiya wênekêşên kurd yê qorê (kuşak) xort di nav rojên 24-29 i İlonê da vekiriye. Evara 28 i İlonê hewşa sergiyê da civinek pêk tê û listikvanê tiyatroyê İsmail pandomim dileyize. Sêrgiya wêna herroj seet pişt nivro ji 13.00 a heta 19.00 a ji heve. Ji Siwêdê Siyabend, ji Nürnbergê İsmail, ji Frankfurtê E. Bulut bi wêneyên xwe tevi sêrgiyê dibin.

**İlon 29 , roja şemi seet 19 ê êvarê**

## **KOMÊN GOVENDA-DENGBÊJ Û SAZBEND-ŞANOYA BÊ DENG**

Komên reqasvanên kurda ji Berlina rojava, ji Kolnê, ji Frankfurtê govendên Kurdistanê digrên û direqisin. Dengbêjê kurda bi nav û deng Şivan Perwer, Nizamettin Ariç, Delal û Kemal bi dengên xwe delal û aziz kilamên gelê kurd distirên. Komela Karkerên Kurdistan, bi şano ye ke bêdeng kuştina 29 kurda yê ku bi destê pasdarên Xumeynî çavgirêdayi gullebaran bûn tinin birê.

**İlon 30 , roja yer şemê danê êvarê seet 18 A**

## **FİLM EM KURDİN Û YAN AZADİ YAN MİRİR**

Rejisorê Gurci Gia Tschubabria û kamarevan Alexander Wodolashewski li Komara Gurcistanê ser rewşa kurda filmek çêkirin. Film bi girani qala pêştacıyina çanda kurdên Sovyetistanê dike û kurd pesna jiyina xwe di bin baskê Sovyetistanê da dimêrinin. "Em Kurdin" filmeki dokumental û gellek baş e.

Yan Azadi yan mirin sala 1981 li Kurdistanana İranê hat çêkirin. Di vi filmi da zilma sazumana Xumeynî kevneperest û diji erişên pasdaran şer û berxadana gelê kurd û pêşmergeyên gel dike. Disa di film da ambargoya ser Kurdistanana İranê nişan dide.

Her du film ji renginin û pişt filman li ser kurda dan û standin çêdibe.

Bo vi hefteyi Bibliographiayek ji neşir dibe. Bibliographia, piraniya pirtukên ku li ser kurdan bi zmanê Ingilizi, Fransizi û Alamani derketine dide naskirin.

## **NAVNIŞANÊN PROGRAMA HÊFTE**

**Roja yekemin**

**Roja duwemin**

Volkshaus kleiner saal  
Eschenheimer Anlage 40  
6000 Frankfurt am Main  
Telefon 0611/55 51 14

ESG  
Lessingstr.2  
6000 Frankfurt am Main  
Telefon 0611/72 91 61



## **Roja sêwemin û roja çardemin**

Gallus Zentrum  
Krißtelersstr.55  
6000 Frankfurt am Main  
Telfon 0611/57 60 14

## **Roja pencemin**

Christuscirsche  
Beethovenplatz  
6000 Frankfurt am Main  
Telefon 0611/75 20 98

## **Roja şeşemin**

Volsbildungsheim Grosser saal  
Eschenheimer Anlage 40  
6000 Frankfurt am Main  
Telefon 0611/55 51 14

## **Roja hewdemin**

Kommunales Kino  
im Deutsche film museum  
Schaumainkai 41  
6000 Frankfurt am Main 70  
Telefon 0611/ 212 88 30

# **B A N G**

---

Piranfya nivîsarên ku heta nuha di kovara Têkoşer de hatine weşandin çend endamên me nivîsfne. Lê, di her du hejmarên dawîn de, çend gotar ji welatên din ji me re hatin şandin û dilê me bi wan pirr xweş bû.

Em hêvî dikin ku, roj bi roj, xwendevanên me ji me re bêtir nivîsarên heja bişfin. Kovara me ne malê me yan malê çend nivîskaran e. Ew, ji her Kurdekî ku dîtînin xwe yê siyasî naxe nav nivîsara xwe re vekirfye.

Pêşveçûna ziman, çand û bêjeya me bi tenê bi hevkarîya me tevan pêk tê.

**TÊKOŞER**

# X E B A T A M E

## 15\_GULAN\_1984

Civîna CLIFI (Komîta pêwendî ya Jinên Biyanî). Ev komîte dixwaze li ser pirsên jinên biyanî li Belçîka dosyeke pêk bîne.

## 2 HEZIRAN 1984

Me slavnameke ji KOMKAR re, di mûnasebeta kongra wê ya 6'mîn de, şand. Me, di vê silavnamê de, piştgirtîya Komkar kir û ji kongrê re serfirazî xwest.

## 2 HEZIRAN 1984

Cêjna komela Merkeza Çandî ya Karerên Tirkiyê. Me di şevê de xwarinên kurdî çêkirin û mûsîqa kurdî pêşkêş kir.

## 5 HEZIRAN 1984

Civîna Komîta Belçîkî ji bo Mafên Mirovatîyê li Tirkiyê. Em li ser civîna çapa Parlamenterên Ewropa ku çû bûn dîtina girtîgehên Tirkiyê û Kurdîstana Tirkiyê peyivîn. Me li ser xebateke dijî cunta faşîst, di munasebeta 12'ê Ilonê de, û li ser şandina delegasyoneke (heyeteke) ba wezîrê Karên Derve yê Belçîka, Léo Tindimans, jî axaft.

## 6 HEZIRAN 1984

Em beşdarî civîna çapê ya Koordînasyonê (nêzîkî 200 komele endamên wê ne), li ser helbijartinên Parlamana Ewropa û rewşa biyanîyên Ewropa, bûn.

## 8 HEZIRAN 1984

Civîn bi nûnerên DISK û komelên tirk re, ji bo pêkanîna şeva DISK.

## 9 HEZIRAN 1984

Civîn li IZOL (bajarê Leuven) bi komelên Kurdên Iraqê re (YXLKE, liqê Belçîka, û KSSE, liqê Belçîka), li ser girtin û eşandina xwendekarên kurd ji aliyê leşkerê Iraqê (rûpel 10 binêre).

## 11 HEZIRAN 1984

Civîna duwemîn ji bo amadekirina şeva DISK'ê. Komîta berpirsiyarên şevê hat helbijartin. Endamek ji Têkoşer jî di komîtê de cih girt.

## 14 HEZIRAN 1984

Em beşdarî civîna RAAD (Komela Flaman ya Konseya Çandî û Civakî), li ser rewşa biyanîyan di Beledîya Saint-Josse de (li Bruxel), bûn.

## 19 HEZIRAN 1984

Civîna Maaserelfonds (komeleke pêşverû û belçîkî) ji bo amadekirina şeveke multikulturel (ji hemî çandan), di meha flonê de.

## 19 HEZIRAN 1984

Komîta Tirkiyê, endamek ji Têkoşer, MRAX û endamek ji sendîka CSC, bi hev re, weke delegasyoneke, çûn dîtina Wezîrê Karên Derve yê Belçîka. Ew ji aliyê şefê kabîne hatin qebûl kirin. Endamê Têkoşer nivîsarek li ser rewşa Kurdîstana froyîn pêşkeşî şef kir û li ser mafên gelê kurd rawesta (rûpel 9 binêre).

## 24 HEZIRAN 1984

Şeva DISK'ê. Nûnerê Disk'ê, Yucel TOP, axaftinek li ser rewşa Tirkiyê û sendîkalîstên di girtîgehên de kir. Çend sendîkalîstên ewrupî jî di şevê de peyivîn. Alîkarî û silavname ji Têkoşer hat dayîn. Hoza-nê kurd HEVAL û senetkarên tirk, Tûlay GERMAN û Fuat SAKA jî, beşdarî şevê bûn, klam û stranên xwe yên hêja pêşkêş kirin.

## 4 TEBAX 1984

Ji bo kongra AKSA, Berlîn, me slavnameke piştgirtîyê şand.

## 25 TEBAX 1984

Civîna Konseya Biyanîyan di beledîya Saint-Josse de (li Bruxelles). Em li ser rewşa biyanîyan û cêjna Qurbanê peyivîn. Beledîye ewê, di her rojê pêşîn ên cêjnê de, çend karker bişîne cihê şerjêkirina pêz (mezbexane).

## 15-31 TEBAX 1984

Her roj piştî nîvro berpirsiyarek ji Têkoşer, bi komela Porte Verte re, li ser hinkirina xwendin û niyfsandin, ji bo biyanîyan, re xebitî.

### 26 TEBAX 1984

Li ser daxwazfiya piraniya endamên Têkoşer, Kongra neliwext, ji bo ku di destûra Têkoşer de hinek guher-tin bîn çêkirin, pêk hat. Ev des-tûr hat edilandin, rapora xebat û malfiyê hat darîçavkirin, komfita birêvebir û a redaksiyona kovarê hatin helbijartin.

### 3 ILON 1984

Civîna Komfita Tirkîyê, ji bo ama-dekirina civîneke çapê di munase-beta 12 flonê de.

### 7 ILON 1984

Civîna çapê li ser rewşa Tirkîyê û Kurdistanê Tirkîyê, di munasebe-ta çar salîya Cunta Faşîst, ji aliyê parlamenterên Belçîkî ku endamên Parlamana Ewropa ne û çend rê-xistinên Belçîkî. Ev parlamenter, berê çend mehan, çû bûn Tirkîyê û li wira bi gelek kesan re axafti bûn. Parlamenter Willy KUYPERS li ser mafên Kurdan û hindikayîyan baş peyivî. Wî nîşan da ku di za-gona bingehî ya Tirkîyê de tu gel ji xeynî Tirkan tune. Em jî, li ser êşandina giştî û gellerî li Kurdistanê Tirkîyê peyivîn.

### 12 ILON 1984

Em çûn Parlamana Ewropa li Stras-burg û beşdarî civîna çapê, li ser rawestana alfarîya maddî ji bo Tirkîyê, ku ji aliyê parlamenterên belçîkî, Jef ULBURGHES û Paul STAES, hati bû amadekirin, bûn.

J. Ulburghes ji Bazara Ewropa ra-westana 60 milyon dolar ku ji bo Tirkîyê, berê ku Cunta Faşîst bê ser hukm, hati bûn amadekirin, xwest.

P. STAES jî, projeye biryareke di-jî hikumeta Tirkîyê pêşkêş kir. E-ger ev proje ji aliyê 21 Parlamen-terên Ewropî bê îmzakerin, ewê li ser pîrsa Tirkîyê li Parlamana Ew-ropa bê axaftin. Di vê projê de bendên pîrr giring û hêja hene. Di nav wan de jî, bendek li ser mafên gelê kurd heye. Endama Partiya KESK a Alman, Brigitte HEINRICH, bi xurtî lîzên Cunta Faşîst darîçav kir: gava ku delegasyonê Konseya Ewropa, di meha gulane de, çû bû ziyareta girtîgeha Diyarbekrê, berpirsiyarên leşkerî ew xapand, çend girtiyên ku nîşanî wê da xis-ti bûn hucryên derewîn û lîsteke derewîn ku tê de navên kesên sax,

lê ku, xwedê giravî, Amnîstî In-ternational weka mirî flan kiriye, dan wê. Li gora Amnîstî, ew tu na-vên ewha ne weşandiye! Endamek ji Têkoşer jî, rewşa Kurdistanê Tir-kîyê û zordestiya leşkerî li ser gelê me da nasîn.

### 13 ILON 1984

Em beşdar bûn cenazê filmçêkerê kurd ê mezin, YILMAZ GUNEY, ku di roja Yekşemê, 9'ê Îlonê, de, di nexweşxaneke fransîz de, li Parî-sê, çû dilovanîya xwe. Me cenazê wî, li ser daxwazfiya wî, anf ENS-TITUYA KURDÎ. Ji saet 9.00 heta 14.00 kesên fransîz, kurd û tirk hatin sersaxîya jin û keça wî û serokê Enstîtuya Kurdî. Di saet 14.00 de me cenazê wî bir "Place de la République" û ji wira heta goristana "Père Lachaise" ku di dema Komuna Parîsê de şehîdên şo-reşê tê de hati bûn veşartin. Di rêveçûna cenazê de nêzikî 6000 kes hebûn. Li ser gora wî, Profes-orê tirk ê bi nav û deng ku li Tirkîyê ji aliyê faşîstan hati bû felç (şeht) kirin, Server TANILLI, avuqatê kurd, Şerafettîn KAYA, û Serokê Enstîtuya Kurdî, KENDAL, li ser jîna wî peyivîn.

### 21 ILON 1984

Sersaliya Partiya Komunîst a Uru-guay li Bruxelles. Du nûnerên Tê-koşer beşdarî şevê bûn û bi silav-nâmeke piştgirîya gelê Uruguay û hemî gelên Latino-Amerîka kirin.

### 22 ILON 1984

Şeva multiculturel (hemî çandan) li Bruxelles. Em bi raxistina pîr-tûk, broşur û kasetên kurdî beşdar bûn.

### JÎ ALIYÊ ÇAPÊ

Me gotarek bi fransîzî û flamanî, li ser jîna YILMAZ GUNEY, nivî-sand û ji gelek kovarên belçîkî û biyanî re şand.

# TÊKOŞER'DEN

# HABERLER

15 Mayıs 1984 ;

CLİFİ ( Belçika'daki Yabancı Kadınların ilişkileri Komitesi) toplantısı yapıldı. Adı geçen komite Belçika'daki yabancı kadınların sorunları, problemleri üzerine bir dosya hazırlamak istiyor.

2 HAZİRAN 1984 ;

KOMKAR'ın 6. kongresine bir dayanışma mesajı gönderdik, kongrelerini destekleyip başarılar diledik.

2 HAZİRAN 1984 ;

Türkiyeli İşçiler Kültür Merkezi tarafından düzenlenen geceye, Kürdistan yemeklerini ve müziğini sunduk.

5 HAZİRAN 1984 ;

Türkiye'de İnsan Haklarını Savunma Komitesi (Belçikalılardan oluşuyor) tarafından düzenlenen toplantıya katıldık. Türkiye ve Türkiye Kürdistanı'nda hapis-hanelerde incelemelerde bulunmak üzere giden Avrupa Parlamentosu parlamenterleri tarafından yapılan basın konferansının değerlendirmesini yaptık. 12 Eylül'de Faşist Cunta'ya karşı Türkiyeli ve Kürdistanlı demokratik örgütler olarak birlikte ne yapabiliriz ? Konusu görüşüldü. Belçika Dışişleri Bakanı Léo TINDEMANS'la görüşmek için bir heyet (delegasyon) oluşturulması üzerinde konuşuldu.

6 HAZİRAN 1984 ;

Koordinasyon Komitesi ( 200 Belçika'lı yerli ve yabancı örgüt bu komiteye üyedir ) tarafından düzenlenen basın konferansına katıldık. Avrupa parlamentosu seçimlerinin değerlendirilmesi ve Avrupa'da göçmen işçilerin, yabancıların hakları üzerinde konuşuldu.

8 HAZİRAN 1984 ;

DİSK temsilcisinin daveti üzerine, DİSK adına bir gece tertip etmek için diğer Türkiyeli örgütlerle toplandık. Demokratik kitle örgütleri olarak yapabileceğimiz katkıyı tartışıp görüştük.

9 HAZİRAN 1984 ;

İZOL ( Flamanların Leuven şehrinde ) da Irak'lı demokratik Kürt örgütleri (Avrupa'daki Kürdistanlı Genç ve Öğrenciler Birliği Belçika şubesi, Avrupadaki Kürdistanlı Öğrenciler Birliği Belçika şubesi ) ile Irak Kürdistanı'nda öğrenci boykotları

nı değerlendirip bir eylem koymak için toplandık.

11 HAZİRAN 1984 ;

DİSK gecesi için 2. bir toplantı yapıldı. Gece Hazırlık Komitesi oluşturuldu. Têkoşer'den de bir üye adı geçen komite de yer aldı.

14 HAZİRAN 1984 ;

RAAD ( Flaman kültür örgütü) toplantısına katıldık. Brüksel'in Saint-Josse belediyesindeki yabancıların sorunları üzerinde bilgiler verdik. Birlikte daha verimli çalışmaların yapılabileceği üzerinde duruldu.

19 HAZİRAN 1984 ;

Belçikalı ilericilerden oluşan Maaserelfond örgütü tarafından multikültürel bir gece yapılması üzerinde yapılan toplantıya katıldık.

19 HAZİRAN 1984 ;

Türkiye'de İnsan Haklarını Savunma Komitesi, Têkoşer, MRAX ve CSC sendikasıdan birer üyeden oluşan heyet olarak Belçika Dışişleri Bakanlığına gidildi. Adı geçen heyet Bakan'ın Kabine Şefi tarafından kabul edildi. Têkoşer temsilcisi, Türkiye Kürdistanı üzerine güncel yaşam ve Kürt halkının hakları ile ilgili hazırladığı metni kabine şefine sundu.

24 HAZİRAN 1984 ;

DİSK adına yapılan geceye aktif olarak katıldık. DİSK temsilcisi Yücel TOP Türkiye'nin genel değerlendirilmesi ve tutuklu bulunan sendikaçıların durumu üzerine konuşmasıyla açılışı yaptı. Avrupa Hür Sendikalar Konfederasyonundan ve Belçika'nın en büyük sendikaları FGTB, CSC, CGSP den birer konuşmacı söz aldı. Kürt ozanı HEVAL ve Türkiyeli sanatkarlardan Tülay GERMAN, Fuat SAKA güzel ilericilerle deyişleriyle geceye ayrı bir renk verdiler. Têkoşerden gece tertip komitesine mesaj sunarak geceyi desteklediğimizi bildirdik.

4 AĞUSTOS 1984 ;

Avrupa'daki Kürdistanlı Gençler ve Öğrenciler birliği ( YXKE ) Berlin'e dayanışma mesajı sunduk.

16 AĞUSTOS 1984 ;

Avrupa'daki Kürdistanlı Öğrenciler Birliği AKSA Berlin'e destekleme mesajı gönderdik. Kongrelerine başarılar diledik.

25 AĞUSTOS 1984 ;

Saint-Josse belediyesi Yabancılar Konseyi toplantısına katıldık.Kurban Bayramı için Anderlecht mezbanesine,Türkiyeli ve Fas'lı müslümanlardan Kurban keseceklere kolaylıklar sağlamak için belediyenin birkaç işçi vermesi uygun görüldü.Yabancıların sorunları üzerinde duruldu.

15-31 AĞUSTOS 1984 ;

Têkoşer'den bir sorumlu Molenbeek komünün de " Porte verte " kuruluşu tarafından yabancılar fransızca kursları için kullanılan metodları yerinde görmek ve katkıda bulunmak üzere her gün öğleden sonraları aktif olarak çalıştı.

26 AĞUSTOS 1984 ;

Têkoşer çoğunluk üyelerinin istemi üzerine tüzüğü gözden geçirmek ve düzenlemeler yapmak için Olağanüstü toplantıya (Kongreye) gidildi.Tüzükte bazı değişiklikler yapıldı. Çalışma ve mali raporlar kongreye sunularak aklandı.Yeni Yönetim Kurulu seçiminden sonra Têkoşer dergisinin redaksiyonu belirlendi.

3 EYLÜL 1984 ;

Türkiye'de İnsan Haklarını Savunma Komitesi tarafından 12 Eylül'ün 4. yılında birlikte bir eylem tesbit etmek için toplandı.

7 EYLÜL 1984 ;

Belçika'lı Avrupa Parlamentosu üyelerinden bir kaç parlamenter ve kuruluşun birlikte faşist cuntayı 4. yılında protesto etmek için bir basın konferansı düzenlendi.Adı geçen parlamenterlerin bir kısmı bundan bir süre önce Türkiye ve Türkiye Kürdistanı'nın da incelemelerde bulunmak üzere gitmişlerdi Faşist cunta ve ardından gelen civil parlamenter rejimin insan haklarını nasıl çiğnediklerini, uluslararası antlaşmaları nasıl ihlal ettiklerini belirttiler.Konferans sa bahı adı geçen parlamenterler Türkiye büyük elçiliğine yazılı bir protesto mektubu sunmak istedilerse de, kabul edilip içeri alınmaları red edildi. Parlamenter Wly KUYBERS Kürt halkı ve diğer azınlıkların haklarının nasıl çiğnediğini vurguladıktan sonra Türkiye Zorba yasasının uluslararası antlaşmaları,insan haklarını hiçe saydığını,red ettiğini anayasadan maddeleri flamanca ve Fransızcaya çevirerek gözler önüne serdi.

12 EYLÜL 1984 ;

Avrupa Parlamentosunun Strasburg'ta Belçika'lı Avrupa Parlamentosu üyelerinden Jef ULBURGS ve Poul STAES tarafından Strasburg'taki Avrupa Parlamentosunda Türkiye ye yapılacak yardımı durdurmak ve protesto etmek için yapılan basın konferansına parlamenterlerin davetlisi olarak katıldık. J.ULBURGS, Avrupa parlamentosundan Türkiye

ye yapılması öngörülen ve cuntanın iş başına gelmesiyle durdurulup sivil yönetime iktidarın devriyle tekrar gündeme gelen 60 milyon dolarlık yardımın yapılmamasını istedi.Demokrasinin olmadığı bir ülkeye yardım yapılmasının insan haklarına ters düştüğünü vurguladı.

P.STAES de, Türkiye'de demokrasiye geçişin bir aldatmaca olduğunu,buna kanmıyacıklarını belirtti.Türkiye ye karşı bir proje sundu. 21 parlamenter tarafından imzalanırsa Türkiye'nin tekrar gündeme gelip tartışılacağını söyledi.Adı geçen proje'de Türkiye de Kürt halkının hakları ile ilgili bir madde de var.

Alman yeşillerinden HEINRICH Brigitte de, söz alarak Türkiye ve Türkiye Kürdistanı'nda hapishanelerde incelemelerde bulunmak üzere giden Avrupa parlamentosu heyetini eleştirdi.Cunta'nın kendilerini sahte isimler verdiğini ve bu isimlerin uluslararası af örgütüne yayımlandığını ,oysa ki bu isim listesinin hiç bir zaman Af örgütüne yayınlanmadığını belirterek Faşist Cunta'nın iki yüzlülüğünü belirtti.

Têkoşer temsilcisi de,Türkiye Kürdistanı'nın güncel yaşamını haklarının nasıl gasp edildiğini uygulanan ulusal baskıya dikkatleri çekti.

13 EYLÜL 1984 ;

Kürt film yapımcısı büyük sanatkar YILMAZ GÜNEY'in Paris'te yapılan cenaze törenine katıldık.9 Eylül'de geçirdiği mide kanserinden kurtulamayarak Fransa'nın bir hastanesinde daha genç yaşta aramızdan ayrılan YILMAZ GÜNEY'in vasiyeti üzerine;cenazesi Paris Kürt Enstitüsüne getirildi. Avrupalı,Türkiyeli,Kürdistanlı sanatkar, yazar,kişi ve kuruluş, organizasyonlar, Kürt Enstitüsüne başsağılığına geldiler. Saat 9-14 arası kabul'den sonra cenazesi Cumhuriyet meydanına getirildi.Ordan sessiz bir yürüyüşle " Père lachaise " (tarihe 1879 Paris Komünü olarak geçen şehitlerin gömüldüğü mezarlık ) e götürüldü.

Mezarı başında Türkiye'de faşistlerce felc edilen Üniversite Profesörü SERVER TANİLLİ Kürt Senatör, M. Remzi Bucak,Kürt enstitüsü başkanı KENDAL birer konuşma yaptılar. Cenaze töreni enternasyonal marşla sona erdi. Yaşamı ile ilgili açıklamalar için sayfa..... bakınız.

21 EYLÜL 1984 ;

Uruguay Komünist Partisinin Kuruluşuyla ilgili yapılan geceye katılarak Têkoşer adına mesaj sunduk. Tüm latin-Amerika ülkelerinde emperyalizme karşı verilen mücadeleleri desteklediğimizi belirttik.

22 EYLÜL 1984 ;

Belçikalı ve Yabancı bir çok kuruluşun bir likte hazırladıkları mültikültürel geceye kitap standımızla katıldık.

# NOLS Û LE PEN



Roja inê, 28.9.84 de, ewê faşistê fransiz, Jean-Marie LE PEN, bê Bruxelles, ji bo dîtina Roger NOLS, serokê beledîya Schaerbeek û endamê Partîya Liberal ku di warê nijadparêziyê û dijminayîya karkerên biyanî de li Belçîka baş hatiye nasîn.

Enîya Koordînasyonê ku em endamê wê ne û gelek partî, sendîka û komelên belçkî dijî hatina Le Pen rabûn. Roja inê, 21.9.84 de, Komîta Le Pen, di civîneke çapê de, tehlîka hatina Le Pen û fi-rehbûna hêzên nijadparêz û faşist baş nîşan da. Di roja hatina vî faşistî de, 28.9.84, ewê Koordînasyon, partî û sendikên belçkî mîtingeke pîrr mezin çêkin. Bi taybetî, Têkoşer jî ewê tê-keve vê xebatê.

J.-M. LE PEN kî ye? Ew serokê Enîya Netewîya Fransiz ya faşist e. Ji berê jî, ew beşdarî şerrê Vietnam û Cezair bû bû. Di helbijartinên Parlamana Ewropî yê meha Hezîran 1984 de, wî gelek dangan kar kirin (11,26%), ango ji Partîya Komunîs a Fransa bêtir!, û bû endamê Parlamana Ewropa (ev cara yekemîn e di tarîxa Parla-mana Ewropa de ku Faşîstan, bi awakî resmî, kursîkî distînin. Heta nuha, hejmara faşistên Îtalyan, espanyol û yûnanî a piçûk ne dihişt ku Grupeke Faşist pêk bibe. Bi xêra hatina faşistên fransiz, ev Grup pêk bû).

R. NOLS kî ye? Ew heta nuha endamê partîya F.D.F. (Partîya Nav-çeya Bruxelles, a rûniştevanên ku bi fransizî dipeyivin) bû, Lê, anha bûye endamê Partîya Liberal. Li ser de jî, ew serokê beledîya Schaerbeek, li Bruxelles, e. Di vê belediyê de, nisbeta bi-yaniyan digihêje 35-40%. Pîraniya wan jî ji Tirkiyê û Marok hatine. Ji sedemê zorbûna rewşa maddî ya vê belediyê û mezinbûna pîrsên giran ku di nav Belçkî û Biyanîyan de derdikevin, Nols, bi awakî pîrr vekirî, bê şerm û bê tîrs, dijminayîya xwe ji bo biyanîyan venaşêre. Amanca wî ew e ku rûniştevanên belçkî jê razî bibin û wî ji nuh de bibijêrin. Di helbijartinên ewropî de, bi xêra wî, Partîya Liberal, di navçeya Bruxelles de, bû partîya yekemîn (hejmarên Têkoşer, N° 19, 20 û 23 binêre).

Xebata hêja ku bû çend sale, li Belçîka, dijî rêzana hukûmetê a nijadparêz dajo, îsbat dike ku nijadparêzî ne pirseke biçûk yan navçeyî ye. Nijadparêzî, eger meriv dijî wê têkoşinê ne de, digihêje faşîzmê û şerrê. Ew ne bi tenê hissekî bê zerer e. Gava ku hêzên rêzanî û aborî jî vî hissî kar dikin û wî di nav xelkê de belav dikin, demek tê ku gel nerazibûna xwe ya maddî û manewî da-vêje ser biyanîyan, dêlva ku wê bavêje ser hukûmet û sermayedaran. Bi vî awayî, sûcê krîza aborî dikeve stuyê biyanîyan û hukûmet digihêje amanca xwe.

## dûmahîya rûpel 8

bû. Ew bi tenê gava ku serokatîya nuh a Begdadê di sala 1968 de hati bû hukmê û tenezzulên ciddî kirin rawestîya. Zagona 11 adara 1974 ku mafên Kurdan ji bo otonomîyeke navçeyî nas kirin eger hemî daxwazîyên meşrû ên Kurdan (bi hêzani pîrsa navçeyî) qebûl ne kirin jî û eger bi awakî ciddî, ne bi naveroka xwe û ne bi şiklê xwe, ne hat tetbîq kirin, wî cihekî dfrokfyekî giring stend. Ev nîşan dide ku ji çareya pîrsa kurdî nêzîkbûn mumkun e.

Gelê kurd ku ji bîst milyon kes e ewê di hemî perçeyên Kurdistanê de mafên xwe, eger di destpêkê de piçûk bin jî, bistîne. Ew têkoşîna xwe dike ji bo mafê xwe yê çarenûsî ku di demên îro de naveroka wî yê yekemîn otonomîya netewî ye. Ev têkoşîn dîr û dirêj e û ne sivik e. Dijminên gelê kurd di rîya amanca wî ya dawîn de zorîyên giran û ne hindik danîne. Lê, hin delîlên ku hêvîyê didin me hene, ango, em roj bi roj pêwîstîya çêtîrbûna bîngehî a vê rewşa zor ku Kurd tê de dijî têdigihêjin.

## dûmahîya rûpel 11

Ez dizanim ku li derveyî welêt hinek xebat tevger (eylem) tîn çêkirin, lê em ji bîr nekin ku cihê xebatê ya mezin Kurdistan e. Li her derê Kurdistanê dest bi avakirina lojmanên polîs û cendirma kirine. Kîna gel roj bi roj zêde dibe, ewê rojek bikele û bifûhre.

## sayfa 29 un devamı

YAYIN ALANINDA :

YILMAZ GÜNEY'in yaşamı ve kişiliği üzerine Fransızca -Flamanca yazdığımız teksti tüm belçika dergilerine gönderdik.

## dûmahîya rûpel 18

zîn li ser olên cûdf, fille û misilman kiriye.

## Di bin Îslamê de

Di bin împeratorîya misilman û di navçeyên cihê de, şexsiyetên kurd gelek dibistanên dîni û mizgeftên ku ji wan zanayên bi nav û deng derketi bûn ava kirin. Keşî Thomas Bois, di kovara Proche-Orient Chrétien de dibêje: "Em karin dîr û dirêj listeyên olzan, huqûqzan, dfrokzan û zanayên ku eserên wan pîr giring in bijmêrin.... Di nav he-yeta mamûsteyên zanîngeha Qahirê, El-Ezher (Misr), a bi nav û deng her dem Kurd hebûn".

(1) Duschesne-Guillemin, Religions de l'Orient Ancien, Coll. Je sais, Je crois, N° 141, 1957, p. 103.

(2) Ghirshman R., l'Iran des Origines à l'Islam - Payot 1951, p. 142.

Eger em bîr kîtla Kurdan, hemû zana di yek dîtin de ne ku merivê kurd ne pîr dîndar e. Pêşgotîyeke tirk dibêje: "Eger em Kurdekî bi yekî gawir (fille) muqayese bikin, em karin bêjin ku ew misilman e"!

Îro, pîranîya Kurdan misilman in. Lê, hindikayîyên wan ên zerdeştî, fille û nêzîkî 50.000 yezîdî jî hene. Yezîdî hin bawerîyên her du olên zerdeştî û îslamê tevî hev kirine. Ew paşhatîyên xwendevanên Şêx Hadî (1073-1163) ne. Hin ji wan re şeytanperest dibêjin. Lê, ew ne rast e. Ew bawerî ku ewê xwedê şeytan bibihure, loma ew navê wî bilêvnakin û wî lanet nakin.

Dûmahî heye

# STRANEK GELERÏ: XERABO

(1)

Xerabo, Xerabo, weleh û bileh, tu xerab f.  
Tu bi xalixalê, bi gotinê çênabî.  
Malê te pir e, ji canê te re edabo!  
Qama te kin e, hemberî taximê memikê min nabo!  
Şevê Kanûna dirêj, tu ji ber serê min ranabo!  
Belkî debara te dibe, ebûra min di mala bavê mi de nabo!

Xerabo, weleh, tu xerab f.  
Tuê ji dinyaê, ji alemê xerabtir f.  
Tu ji koma pismamê mi çêtir f.  
Serê memikê mi, rebena Xwedê, mînayî tiriye Çêlikê Eliyê Remo, di  
çax û benga xwe de dikemilî.  
Serê memikê mi, rebena Xwedê, mîna Qesrê Pirota, serê Mihela  
Meşkîna avakirî.

Xerabo, dîno, havîn e, xweş havîn e.  
Nanê cehîn e û dewê tirşîn e. Serax û binraxa min û xelkê delal  
ebakî şalîn e.  
Heçî derdê dila ne dî be, bila nebîne!  
Tu rabe, ji mi re gwîzaneke berbera bîne!  
Ezê serê memikê xwe biçipilînim, ji kala re bikim taştê, ji xorta  
re bikim feravîne  
Bazê dilê min rojîya se meha digire, bila êvarê pê fitara xwe  
bişkênîne.

Xerabo, xerabê dînê, te mîka xwe daye bi bizinê,  
Te gula xwe daye bi sosinê.  
Te berê xwe daye qetlê û sêpaê zînê.  
Ez û Xerabê bi tenê şevê nivê şeva li zikaka biniya mala li hev  
rûniştin.  
Me gilfkê xwe pev kirin û gazindê xwe dihiştin,  
Kundê şkêra, wawîke ber devê çema, li halê min û bejna zirav  
diponiştin,  
Mirîkê gorê di mezela, ê go isal hezar û pênc sed sal mirî bûn,  
kefenê xwe li cemcumê serê xwe gerandin, li ser qebrê xwe rûniştin,  
Li halê min û bejna zirav diponiştin.  
Ez bi te re dost bûm, tu bi mi re dijmin bûyî.  
Tu li paş xanfika li min dikelistî, te derbek bi tifingê berda mi,  
ez dikuştim.  
Şevê nivê şeva, te bi destê tola jina xwe girt, û ez li ber dîwara  
dihîştim.  
Xerabo, Xerabo! Xwedê teala bike, Rebî, heçî ji xerabê min re bêje  
"Tu xerabo",  
Bila karîn û warîna zarokê nêr tu care di mala wan de nabo!  
Bila sed olçek genimê sor li bine beriya Merdînê biçîne, li şwîne  
bila qerezîwana reş nabo!  
Emayî, bila kuliyê par û pêrar lê rabo!  
Bila salekê bîne ser benderê, gêre bike û bidêre, ew ji jê re bi  
ka bo!  
Kulmek zadê ji wan re safî nabo!  
Heçî ji Xerabê mi re bêje: "Tu baş î, tu pri qenc î, "Xwedê teala  
bike, Rebî, kulmek garîsê li piştî mala biçîne,  
Li şwîne sed olçek genimê sor hilîne;  
Bi ofara binî qîza şêxkî, axakî ji xwe re bîne;  
Zikata malê vê salê bide min û bazê dila, emê pê daweta xwe li dar  
xînin.

(dûmahî heye)